


Mitterrand bo Rûdaw'ê axifî:

## Kurd, wek zarokên min in!

Çalakvana mafê mirov, dosta Kurd, Seroka Weqfa Azadiya Fransa û jina Serokkomarê Fransa, Fransuwa Mitterandê koçkirî, Danielle Mitterrand dema bahsa têkiliya xwe û Kurdan dike, wek ku bahsa zarokên xwe bike, bi hêstiyarî diaxife.

Rûpel 7




Ciwan Haco dixwaze di televîzyonên kurdî de kar bike:

## "Lê bi belengazî bername çênabin"

"Sûcê hemû partiyên kurdî di vê meselê de heye. Wan wilo lê kiriye ku muzîka kurdî ji bacanên sor erzantir bibe. Bazara muzîka kurdî tuneye, eger hebe jî, ketiye nav destên partî û dezgehên kurdî de."

Rûpel 10



Rêvebirê CIA yê Kurdistanê Faedes:

## PDK û YNK hevpeymanên me yên baş bûn

Charles Faedes di dema operasyona Îraqê ya sala 2003an de Rêvebirê Başûrê Kurdistanê yê CIA bû. Navbirî pirtûkekî li ser çalakiyên xwe yên Îraqê bi navê "Operasyona Otêla Kalîforniya" belav kiriye.

Rûpel 4


# Rûdaw

Deutschland, Östereich, Holland, Belgien, Frankreich 1,50 Euro · Schweiz 2,70 CHF · Großbritannien 1,40 GBP · Schweden 21,00 SEK · Dänemark 15,00 DKK

00028

4 191631 701506

www.rudaw.net ■ rudaw@rudaw.net ■ Tel.: +49 (0) 221-26 00 40 02 ■ Fax: +49 (0) 221-26 00 49 81


Nêçîrvan Barzanî:

# Hêvidar im dewleteke serbixwe ya Kurdan jî hebe

**Hewlêr (Rûdaw)** - Serokê Hikûmeta Kurdistanê Nêçîrvan Barzanî ragihand ku daxwaziyên gelê Kurdistanê yên ji Hikûmeta Bexdayê dikin rewa ne û ew çawerê dikin ku Bexda sozên dayî pêkbîne.



Di hevpeyvînekê digel Kurdistan TV de, Nêçîrvan Barzanî di derbarê karûbarê hikûmeta xwe ya çar salên borî de axifî û got, 'di temenê kabîneya pêncem de, PDK, YNK û aliyên din yên siyasî karê xwe kirine.'

Serokê Hikûmeta Kurdistanê, giliyên xelkê Kurdistanê yên ji deshilatê jî wek tişteki asayî binavkir û wiha got: "Bi baweriya min giliyên xelkê gelekî asayî ne. Ma xelk çi ji me dixwaze? Daxwaza wan ew e ku em hewla baştirkirina jiyana wan bidin û bêhtir çaksazî di vî welatî de pêk bînin. Ev daxwazên gelek normal in û erka me jî ew e ku em van tiştan bikin."

Di derbarê geşepêdana aborî li Kurdistanê jî Barzanî got ku armanca sereke ya hikûmeta heremê, birêvebirina bazara azad û sektora taybet e. Li gor serokwezîr ev tişt bi dînamoya geşepêdana aborî ya herema Kurdistanê ye. Barzanî bahsa yasaya viberhênana li Herema Kurdistanê jî kir ku ew yasayeke ron e û wê ev yek sektora taybet bihêztir bike û li Kurdistanê gelek asankariyan jî ji viberhêneran re bike.

Di derbarê derxistina neftê li Herema Kurdistanê jî Nêçîrvan Barzanî got tevî hemû gefên Hikûmeta Bexdayê, heta niha nêzîkî 35-36 şirketên biyanî yên petrolê li Herema Kurdistanê kar dikin. Serokwezîr got girêbestên ku Kurdistanê di warê neftê de îmze kirine destûrî ne û di çarçêva destûra Îraqî de ne: "Em li benda Bexdayê namînin, da ku ew ji me re bêje viha bikin."

Barzanî got bi hinartina neftê ji bo derve, Hikûmeta Kurdistanê îsbatkir ku dikare bibe xwedî tesîreke mezin: "Dabînkirina enerjiyê îro buye pirsgirêkeke mezin ji bo welatên cîran, Ewrûpa û heta Amerîkayê jî. Hinartina neftê ji bo Kurdistanê destkeftiyeke mezin e."

Serokwezîrê Hikûmeta Kurdistanê di dawiya axaftina xwe de jî got, wek Kurdekî ew hêvîxwaz e ku rojekî Kurd bibin xwedî dewleta xwe ya serbixwe: "Lê îro rewşa Kurdistanê wiha ye ku em beşek in ji Îraqê û divê em di wê çarçovê de kar bikin."


## "PKK tevlî Konferansa Hewlêrê nebe, wê pirsgirêk derkeve"

Serokê DTP'ê Ahmet Türk:

# Zemînê çekdanînê nîne

**Ako Mihemmed**

**Enqere (Rûdaw)** - Em di bin kontroleke tund de di pirsgeha Parlamena Tirkiyê re derbasî hundir dibin. Di beşê fraksiyona 22 kesî ya DTP'ê de, Kurdayetî di jêr wêneyê damezrênerê Komara Tirkiyê Mustafa Kemal Atatürk de dengekî bihêz heye. Dema em dikevin hindir rastî Akın Birdal tên. Ew parlamenterê DTP'ê yê Amedê ne Kurd e. Rojnamevanên Tirk jî bo axaftina li ser pirsgirêka Kurd diçin cem parlamenterên esilkurd yên AKP'ê ya desthilatdar. Parlamenterê DTP'ê İbrahim Binici li ser AKP'yiyên Kurd wiha dibêje: "Ew parlamenterên Kurd yên AKP'ê ji me re dibêjin 'hûn çawa diwêrin wan axaftinan bikin. Em jî ji wan re dibêjin 'em wê hêzê ji gelê xwe û rewabûna doza xwe digrin. Ger baweriya we jî bi wê hebe hûn jî dikarin wek me biaxifin."



Sekreterê ku deriyê odê ji me re vekir, bi nermî ji ber me rabû û bi nermî bi me re axifî. Ew Ahmet Türk ê ku îsal Barack Obama ji serokên fraksiyonên Parlamena Tirkiyê yên din 3 deqîqe zêdetir wext xwe jê re veqetand, êdî li cîhanê navekî xwiya ye. Ahmet Türk dibêje: "Min zanibû mebesta rêzerûniştinên Obama ya bi partiyên meclîsê de ew e ku bikarine li gel min rûne."

Türk keseke nefsbiçûk û vekiriye. Li cem wî kevnewezîrekî dewleta Tirkiyê Adnan Ekmen rûniştîbû. Wî digot 'ez nikarim li gel DTP'ê kar bikim, lê dikarim bi Ahmet re danişîm û gotûbêjê bikim.'

(Li rûpela 11)

Parêzerê Öcalan, Ömer Güneş:

# Divê tenê girtiyên Kurd bişînin Îmraliyê

**"Niha li Îmraliyê înşeatekî tê çêkirin. Ji dû avahiyan pêk tê. Yek, ji bo girtiyan e. Yek jî li kêlekê ye, ew jî ji bo rayedaran e. Înşeat niha li ber xelasiyê ye. Bi texmîna min wê înşeat di nava dû mehan de biqede."**



**Salihê Kevirbirî**

**Stenbol (Rûdaw)** - Ji ser girtina Serokê PKK'ê Abdullah Öcalan 10 sal derbas bûn. Ev 10 sal in ku Öcalan li Girtîgeha Îmraliyê bi tena serê xwe girtî ye. Li gorî parêzerên wî, ew ji gelek mafan bêpar e û di tecrîtê de dijî. Çend meh berê Wezîrê Dadê Mehmet Ali Şahin gotibû ku wê çend girtiyên din li cem Öcalan bêne bicîhkirin. Ji bo vê yekê li Zindana Îmraliyê avahiyên nû têne çêkirin. Çav li rê ye ku di demeke kirt de çend girtiyên din li cem Öcalan bên bicîhkirin.

Parêzerê Öcalan, Ömer Güneş, li ser mijara bicîhkirina girtiyên din li gel Öcalan pirsên Rûdawê bersivand.

(Li rûpela 11)

## Hilbijartinê xewa Silêmaniyê herimand

**Silêmanî (Rûdaw)** – Ji ber dengê bilind yê mûzîk û dirûşmên propagandayên hilbijartinê, xelkê Silêmaniyê nikare razê. Rûniştvanên Silêmanî ji bê tekûziya propagandayê komîsyona hilbijartinan û saziyên ewlekariyê berpirs dizanin. Rêveberê giştî yê komîsyona hilbijartinan ragihand ku bergirtina awayên propagandayê ne karê wan e. Rêveberê Asayişa Silêmaniyê Hakim Qadir Hemecan jî dibêje 'heta niha li ser wê diyardeyê kesekî li gel wan gilî nekiriye.' Lê Hemecan jî balê dikşîne ser aloziyên kampanyayê û wiha dibêje: "Eger ev yek bidome, em neçar in lêpirsînê bikin."



Nûnerê Kurdistanê li DYA Talabanî:

# DYA divê bi şert çek bifroşe Îraqê

**Washington (Rûdaw)** - Nûnerê Hikûmeta Kurdistanê li Dewletên Yekbûyî yên Amerîka (DYA), dibêje 'ger Amerîka çek bifroşe Îraqê jî divê şert deyne ser bikaranîna çekan.'

Di rûniştinekê de digel rojnamevanan li Washingtonê, Nûnerê Hikûmeta Kurdistanê, Qûbad Talabanî di derbarê vekişîna leşkerên Amerîkayê ji bajarên Îraqê got, 'nabe Amerîka kêfxweş be û fikir bike ku erka wê temam buye.' Li gor Talabanî, erkên Amerîkayê li Îraqê hîn jî mane.



Nûnerê Hikûmeta Kurdistanê li Washingtonê, siyasetên Hikûmeta Bexda yên di warê neftê de jî rexne kir. Ji ber ku hikûmeta Malikî niha bê razîbûna Hikûmeta Kurdistanê, mijûl e girêbestan li gel şirketên petrolê îmze bike, bi taybetî li navçeyên ku ji ji Kurdistanê hatine veqetandin: "Ev siyaset wê yekê diselmîne ku pêwîst e dawî li monopolkirina dewletê bê."

Talabanî ji êrişên li Parêzgehên Kerkûk, Diyala û Mûsilê jî xemgîn e. Di dû hefteyên borî de, li Kerkûkê çend teqîn qewimîn û di encamê de bi sedan kes hatin kuştin û brîndar bûn. Qûbad wan teqînan wek gefeke mezin li ser asayişa Îraqê binavdike.

Qûbad Talabanî ji bihêzbûna Erebên neteweperest yên radîkal jî gelekî dilgiran e. Ji wan grûban jî, Lîsteya Hedba di hilbijartinên civata parêzgeha Mûsilê de pirraniya kursiyan bidest xistibû. Di derbarê Erebên radîkal li Îraqê de Qûbad Talabanî dibêje 'aliyê ku li hemberî bihêzbûna nasyonalizma Ereb rawestiya ye tenê Kurd in.'

Qûbad herwiha ji zêdebûna desthilata Serokwezîrê Îraqê, Nûrî Malikî û Hikûmeta Bexdayê jî dilgiran e. Di vê derbarê de Talabanî wiha dibêje: "Me û Amerîka, ji bo ku diktatorekî li Îraqê biçe û yekî hinekî nerimtir were pêş ewçend qurbanî neda." Nûnerê Hikûmeta Kurdistanê bi taybetî ji ber bihêzbûna leşkerê Îraqê dilgiran e. Li gor wî, fermandeyên leşkerî ku Malîkî destnîşan dike bêtiriya wan kevne Baasî ne.

Li ser pirsên 'Amerîka wê bikaribe alîkariya hêzên leşkerî û asayişa Îraqê bike, bê ku ew alîkarî bibe gef li ser Kurdistanê jî Talabanî wiha dibêje: "Pêwîst e Amerîka bi şert çek û teqemenî bide Îraqê. Gelo Îraq ew çek ji bo çi distîne û wê li dijî kê wan bikarbîne?"

Talabanî amaje bi wê yekê jî dide ku Cîgirê Serokê Amerîka Joe Bieden ku serperiştî û çavdêriya siyaseta Îraqê dike,'xwedî ramaneke wiha ye ku divê rêveberiya nû ya Amerîkayê bi ciddî temaşeyê pirsa Îraqê bike. Qûbad Talabanî hêvî dike ku di encama vekişîna hêzên Amerîkayê de, Herema Kurdistanê ku wek serkeftîtirîn çîroka Amerîkayê li Rojhilata Navîn tê li qelemdan, rastî ziyanê nebe.

www.arsivakurdi.org

Peyama Rûdaw

## Êdî haya me ji hev heye

Bûyerên her neteweyekî dabeş bibin û haya wan ji bûyerên hev nebe, ger bi nav jî yek netew bin, wek kirdar yek nabin. Rojev, hest û bîrkirina wan jî wek hev nabe. Heta bûyerên daniştvanekî Amed û Silêmanî nebin yek, zehmet e em bikaribin fikir li yek netewekî bikin, yek rojev di mêjiyê ferdên wê de hebe.

Serdema şoreşa zanyariyan ku satalîtên sînorbir bi xwe re aniye, televîzyon bûye amrazeke girîng bo Kurd da haya wan ji hev hebe. Lê mixabin ew televizyonên han hizbî bûn û parçegêrî bi wan ve xwiya ye. Ji aliyekî din ve, ji bilî wêya herçiqas Azadiya Welat mînakeke cuda be li Bakûrê Kurdistanê rewşa rojnamegeriya parçeyên dagîrkirî yên Kurdistanê xirab e. Herwiha li gor daneyên Pîrê Rojnamegeriya Kurdî Mehmûd Zamdar, 856 rojname û govar li Başûrê Kurdistanê derdikevin û li gor daneyên Wezareta Plandanînê ya Hikûmeta Herêma Kurdistanê jî 801 rojname û govar lê derdikevin. Lê belê pirraniya rojnameyan lokal in, gelek caran ne tenê derfetê agahdarbûna bûyerên hemû netewe û parçeyên din, herwiha piraniya wan bûyerên hemû bajarên vî parçeyê jî naghînin xwendevanên Kurd.

Herwiha dû rênivîs û nebûna zimanê standart yê yekgirtî yê Kurdî û nebûna çareseriyekî li gel zimannas û entelektuelên Kurd jî rê li ber van pirsgirêkên zêdetir vedike. Lewra dirêjbûna Rûdawê ji Hewlêrê bo Kolnê bi dû rênivîs û dû şêwazên serekî yên zimanê Kurdî girîng tê ber çavê me. Ji ber ev hewldan komkirina netewekîye li ser 24 rûpelan. Pêşveçûna civaka Kurdî, dilgermkirina wê bo guncandineke rastiyane li gel civaka pêşketî ya cîhanê, di karnameya Rûdawê de heye. Herwiha pêşandana xem û pêşketinên niştecîyên xerîbiyê jî mebesta me ye.

Yê me ji xeynî wêya rêbaza karê me girêdayîbûn e bi bingehên pîşeyî û etîketên karê rojnamevaniyê ve. Pêşkêşkirina xizmetguzariyên zanyariyan bo xwêner. Em dixwazin li ser refên pirtûkxane û koşkên rojnamefiroşan li Awrûpa, rojnameya neteweyekî bin, ne ku yê parçeyekî û aliyekî. Em dixwazin bibin cihê sebra 50 milyonên bê dewlet. Em ne li dijî kesî ne û milkê hemû Kurdan in jî. Bûyerekî ku em nikaribin veguhêzin, serê xwêner bi agahiyên ne rast naêşînin. Rûdaw, dixwaze neynika welatekî parçekirî be li Ewrûpa.

Heta niha gelek govar û belavokên Kurdî li Ewrûpa derketine, lê belê Rûdaw bi awayekî meydanî û bi rêya dû nivîsîngehan li Kurdistanê (Hewlêr-Silêmanî), peyamnêrên li bajar, parçên din yên Kurdistanê û welatên Ewrûpa bûyeran bo niştecîyên xerîbiyê kom dike û vedibêje. Evna projeyeke netewî û mezin e, ji bo berdewam be û xwe bi xwedîke, ev bi piştîvaniya hevneteweyên me yên niştecîyên xerîbiyê dibe bi reya kirîn û abonebûna Rûdawê.

**Ako Mihemed**

## Hilbijatinê Bazara radyoyan germ kir



**Silêmanî (Rûdaw)** - Ji dema ku tê bîra wi, Seîd Emînî (59) ji bo agahdar bûn ji bûyerên Kurdistan û cîhanê guhdariya radyoyê dike. Ew zilamê rihspî gelek tam ji zanyariyên nû û nûçeyên germegerm verdigire û hêvîdar e ku cardin nûçeyên nexweş di derbarê welatê xwe de nebihîse: "Bi hêviya xwedê ew hilbijartin bi xêrûxweşî bi dawî dibe."

Bi destpêkirina pêvajoya propagandaya lîsteyan ji bo hilbijartinên parleman û Serokatiya Herêma Kurdistanê, radyofiroşên Silêmaniyê bahsa zêdebûna kiryarên radyoyan dikin. Rêveberên hîn radyoyan jî germbûna bazara dikandaran wedigerînin ser têhnatiya xelkê ji bo agahdariya ji guhertinên dawî û nûçeyên germ yên hilbijartinê.

Saman Mihemedê 27 salî, di wê baweriyê de ye ku radyo baştirîn alawên bo zanîna berdewama zanyarî û nûçeyan di hemû deman de ye û tu erk û xerc jê re pêwîst nîne. Herdema bixwazî dikarî guhdariya nûçe, bername û çîrokên xweş bikî: " Heta ku hilbijartin bi dawî bên, ezê bi pirranî guhdariya radyoyê bikim da ji nûçeyên nû haydar bim."

Ligor amarên Wezareta Pilandanana Hikûmeta Herêma Kurdistanê, radyo li Kurdistanê hene ku pirraniya wan ser bi partî û rêxistinên siyasî ne û beşekî ji wan jî serbixwe ne. Lê ew amar, wan radyoyên nû nagire ber xwe ku bi destpêkirina pêvajoya hilbijartinan dest bi kar kirine.

Firoşerekê radyo û CD'yan bi navê Hamid Mehmûd li bazara Dara Şewitî ya bajarê Silêmaniyê destpêkirina şerê poster û perûkan û rikberiyên hilbijartinê manga gerimbûna bazara xwe dizane: " Hest dikim di wê demê de kiryarên me zêdetir bûne û xelk ji berê zêdetir radyoyan dikirin." Hamid dibêje pirraniya kesên ku radyoyan dikirin kesên bi temen in. Navbirî zêdetir ji wan erzanbûna nirxa radyoyan bibîrtîne.

Dikandarekî din bi navê Necmedîn ku firoşerê radyo, televîzyon û CD'yan gotinên Hamid derbarê germbûna bazara firotina radyoyan dupat dike û di wê baweriyê de ye ku piştî bidawîbûna hilbijartin'ê bazar wek xwe namîne: "Xelk dixwaze bi berdewamî ji rewşê haydar be, ji bo wê jî ji radyoyên baştir bi dest wan nakeve."

Berpirs û rêveberên radyoyan jî, di nav ofîsên xwe de hest bi germbûna bazara radyoyan dikin û wê meselê wedigerinin ser çend egeran ku girîgntirîna wan hilbijartin e. Rêveberê Radyo ya Cemawera Kurdistan, Ehmed Mihemed di wê derbarê de wiha dibêje: " Dema hilbijartinê û listeyan jî dest bi rêklamên xwe kirine, medyaya guhdarkirinê jî xwedî taybetmendî û senga xwe ya taybet e."

Rêveberê Radyoya Newa Kurdo Hesen, ku bi heztirîn radyoya Kurdî tê hesibandin, yêk ji egerên ferqa hilbijartinên vê demê wedigerine ser zêdebûna listeyên beşdar û germbûna rikeberiya di navbera wan da ku dibe sedem xelk bi hûrî bala xwe bide bûyeran. Kurdo dibêje: "Hemû kes xwendevar nînin û nikarin rojnameyan bixwînin. Ji bo TV'yê jî pirsgirêka elektrîkê heye û tenê bi şevan programên nû tên pêşkêş kirin. Ji ber wan sedeman xelk zêdetir guhdariya radyoyê dikin. Herwiha ji bo xelk baştirîn û kanala çavkanî ji bo zanyarî û nûçeyan e."

## Li Kurdistanê enflasyona dezgehên ragihandinê



**Hewlêr (Rûdaw)** – Li gor statistîkên fermî û dawîn yên hikûmetê li Kurdistanê 921 dezgehên ragihandinê hene. Sendîka rojnamevanan û pisporên ragihandinê hebûna ewçend dezgehan pêwîst nabînin.

Li gor rapora dawî ya wezareta Plandanînê ya Hikûmeta Herêma Kurdistanê ew 921 dezgeh bi vî awayî dabeşkirî ne: 281 rojname, 520 kovar, 56 radyo, 42 televîzyonên navxweyî, 18 qenalên esmanî û 4 ajansên dengûbasan. Cîgirê Serokê Sendîka ya Rojnamevanên Kurdistanê Mistefa Salih Kerîm di derbarê dezgehên ragehandinê de ji Rûdawê re wiha daxuyand: "Herçend azadiya derbirînê pêwîst be, lê ez vê yekê wek kaosekî dibînim. Çima 921 dezgehên ragihandinê hene? Gelo kî dema wî heye van rojname û kovaran hemû bixwîne?"

Li gor Kerîm rojname û kovarên niha asta xwenêrên xwe nizimkirine û giringî nadin zanyarî dayînê. Di derbarê danûstandina sendîkayê li gel wan hemû dezgehan jî Mistefa Salih Kerîm wiha dibêje: "Têkiliya sendîkayan li gel wan hemû dezgehan dijwar e. Desthilata me jî tune ye, ji ber ku wek bingeh li gor yasayê rêkxistina karê rojnamevanî li Kurdistanê kesê ku li rojnameyekê, li kovarekê yan li saziyeke ragihandinê binivîse û bêje 'ezê rojnameyekê nû derxînim,' piştî ku rojnameyê belav bike em li sendîkayê tenê sertîfîkaya baweriyê didinê û ji wan tê pirsîn gelo rojnamevan e yan na."

Li gor pisporên warê karê rojnamevaniyê pêwîstiya bi sedem hene ji bo avabûna saziyên ragihandinê. Mamosteyê Koleja Ragihandinê li Zanîngeha Silêmaniyê Dr. Saman Fewzî, ji Rûdawê re bahsa sedemên zêdebûna dezgehên ragihandinê dike: "Sedemê pirbûna dezgehên ragihandinê ne ji ber pêdiviyên Herêma Kurdistanê ye. Beşekî ji wan dezgehên siyasî li pişt wan e. Kesekî yan jî hizbekî wan derdixîne ji bo ku li hember kanaleke din ya ragihandinê kar bike."

Herçend mamosteyê zanîngehê, hejmara bilind ya dezgehên ragihandinê pêwîst nabîne, jî li gor wî ev yek diyardeyeke gelek anormal nîn e: "Hemû welat dema ku ji qonaxekî dîktatorî ber bi qonaxekî demokrasiyê ve diçin, hinek caran bi wê celeba kaos û xwebetalkirinê ve diçin ku xelk dixwaze bi reya kanalên ragihandinê şiyan û hêza xwe nîşan bide."

## Gaza Kurdistanê ji sedî 5 wê ji Tirkiyeyê re be



**Hewlêr (Rûdaw)** - Serokê Komîteya Neft û Gazê yê Parlamena İraqê got wê wek rêjeya berdelê derbasbûna ser xaka Tirkiyeyê, ji sedî 3, heta ji sedî 5 gaz bo vî welatî bê dayîn. Ew rêje jî wê 5 sal piştî destpêka projeyê bê dayîn.

Projeya şandina gaza Kurdistanê ya derve ji aliyê dû şîrketên Ewrûpî û dû şîrketên Erebî tê pêkanîn. Sermayeya projeyê 8 milyar dolar e. Ev proje ji girintirîn projeyên danîna jêrxaneya aboriya Kurdistanê ye.

Bi vê projeyê Herema Kurdistanê dibe çavkaniyeke dabînkirina enerjiyê ji bo welatên Rojavayê Awrûpa, ku niha ew welat gelek ji siyaseta hişk ya Rûsyayê dinalin. Ew projeya ku niha amadekarî jê re tê kirin wê di sala 2014an de bi temamî bê pêkanîn û şandina gazê wê hingê destpêbike. Lê her ji niha ve proje bala gelek welatên rojava dikşîne.

Piştî belavbûna nûçeya ku dibêje li hember şandina gazê li ser xaka Tirkiyeyê re, Rejima Enqerê daxwaza ji sedî 15yê dahata firotina gazê dike.

Serokê Komîteya Neft û Gazê Dr. Elî Husên Belo ji Rûdawê re wiha ragihand: "Diyarkirina rêjeyan bi lihevhatinên navnetewî ye, ne bi lihevhatina navbera Herema Kurdistan û Tirkiyeyê. Çunkî hinartina gaza Herema Kurdistanê bi rêya Tirkiyeyê, projeyekê navnetewî ye û şîrketa Nabûko ev yek cîbicîh dike."

Belo amaje dike ku ji bo diyarîkirina wê rêjeyê çend faktor hene û dikare ji ezmûna derbasbûna gaza Rûsyayê ya bi ser Ukrayna sûd bê wergirtin.

## Şewba berazan ji deriyê Brahîm Xelîl derbasnabe



**Necmeddîn Nêrweyî**

**Zaxo (Rûdaw)** – Hikûmeta Kurdistanê li dijî şewba berazan tedbîrên xwe didomîne. Yek ji cîhên ku di bin sihêtiya rayedarên tenduristiyê de ye Deriyê sînor Brahîm Xelîl e.

Li gor rapora dawî ya Rêxistina Tendirustiyê ya Cihanê (WHO) şewba berazan li 118 welatan belav buye û heta niha 288 kesî ji ber vê nexweşiyê jiyana xwe ji dest dane. Piştî ku şewba berazan gihişt İraqê, li Herêma Kurdistanê jî hat ragihandin ku keçeke sportvan ya yaneyeke basketbolê jî tûşî vê nexweşiyê bûye. Piştî ku Wezîre Tendirustiyê yê Hikûmeta Hêrema Kurdistanê jî got ji ber şewbê ku şeş kes nexweş ketine, lê niha rewşa wan baş e. Piştî daxuyaniya hikûmetê di nav gel de tirs belavbû û bi taybetî kesên ku ji derveyî welat tên Kurdistanê ketin gumanan.

Li dergehê sînor yê Brahîm Xelîl, ku rojane bi sedan kes ji welatên cuda cuda ji ser vî derî tên Kurdistanê heta niha tu nexweşên bi vî awayî nehatine dîtin.

Ji rayedarên heremê Dr. Şivan Hesen ji Rûdawê re diyar kir ku ew bi berdewamî pişkinîna taybet ji bo kesên ji derveyî welat tên Kurdistanê encam didin û heta niha tu rewşeke tûşbûna êşa berazan li deriyê Brahîm Xelîl nehatiye tomarkirin. "Di destpêka şewbê de ku me dest bi pişkinîna rewiyan kir rojane zêdetirî 1200 kes dihatin kontrolkirin û tu kesekî bê pişkinînê derbas nedibû. Niha rojane 300 kes têne kontrolkirin."

Rûdaw

**Xwedî:** Rudaw Media GmbH · **Serokê Civata Birêvebir:** Nûredîn Weysî · nuradinwaisi@rudaw.net · **Sernûser:** Ako Mihemed · akopress74@yahoo.com
**Rêvebirê Beşa Kurmancî:** Faysal Dağlı · faysaldagli@iname.com · **Rêvebirê Beşa Soranî:** Hêmin Ebdulla · hemen@rudaw.nl
**Navnîşan:** Rudaw Media GmbH · Gutenbergstr. 63a · Köln/ Almanya 50823 · **Telefon:** +49 (0) 221.26 00 40 02 · **Telefax:** +49 (0) 221.26 00 49 81
**Web:** www.rudaw.net · **E-maîl:** rudawkurmanci@yahoo.com (Beşa Kurmancî) · **E-maîl:** rudaw@rudaw.net (Beşa Soranî)

www.arsivakurd.org

**Hewlêr (Rûdaw)** - Charles Faedes di dema operasyona Iraqê ya sala 2003an de Rêvebirê Bakûrê Iraqê (Başûrê Kurdistanê) yê Dezgahê Saloxdariya Amerîkayê (CIA) bû. Navbirî pirtûkekî li ser çalakiyên xwe yên Iraqê bi navê "Operasyona Otêla Kalîforniya / Hotel California Operation" belav kiriye û di wê pirtûkê de bi awayekî berçav behsa rola Kurd di wê proseyê de dike. Charles Faedes di derbarê bîranînên xwe yê dema şer û têkiliyên xwe yên bi Kurdan re pirsên Rûdawê bersivand.



### Rêvebirê CIA Li Kurdistanê Charles Faedes:

# Kurd di kar de profesyonel û heval bûn

**Hawar Evdilrezaq**

***Rûdaw: Dema hûn rêvebirê beşê Bakûrê Iraqê yê CIA bûn, peywendiya we li gel serkirdên Kurd çawa bû?***

Charles Faedes: Peywendiya min li gel wan gelek baş bû. Ew piştekê pir bihêz bûn bo me.

***Rûdaw: Gelo peywendiya we li gel Kurd li ser bingehê karkirinê bû, yan li ser bingehê hevaltiyê?***

Charles Faedes: Li ser herdû bingehan bû, ew di warê karkirinê de profesyonel bûn û hevalên pir baş jî bûn.

***Rûdaw: Di hevpeyvînekê de we gotibû, 'di dema operasyona Iraqê de, min û cîgirê xwe Herêma Kurdistanê kiribû dû beş, ez serpereştê navçeya jêrdestê PDK'ê û cîgirê min jî serpereştê herema jêrdestê YNK'ê bû.' Sedema vê yekê çibû?***

Charles Faedes: Sedema wê tenê kargêrî bû, jî ber ew hemû kar bi yek kesî birêve nediçû.

***Rûdaw: Gelo di girtina endamên El-Qaîde û Ensar El-Îslam de PDK û YNK hevkar bûn?***

Charles Faedes: Belê, di encamdana wan karan de hevpeymanên me yên pir nêzîk bûn.

***Rûdaw: Ji bo çi baregehê we yê serekî li Selahedînê bû?***

Charles Faedes: Pir giring û di ciyê xwe de bû nêzîkî serkirdayetiya PDKê bim, bi vî awayî hevkarî û kar hêsantir dibû.

***Rûdaw: Dema hûn wek rêveberê beşê bakûr yê CIA'yê li Kurdistanê bûn, hûn qet bi PKK'ê re civiyan?***

Charles Faedes: Qet min peywendî bi wan ve nekir.

***Rûdaw: Gelo destê CIA di girtina Elî Bapîr de hebû?***

Charles Faedes: Ez nikarim li ser wê yekê biaxifim.

***Rûdaw: We çawa zanî endamên Ensar El-Îslam li navçeya Hewreman û li deverên nêzîkî sînorê Iranê hene?***

Charles Faedes: Ew karê me ye, wan zanyariyan bizanin.

***Rûdaw: We di pirtûka xwe de nivîsiye: 'Di dema proseya azadkirina Iraqê de, hindik mabû CIA û leşkerên Tirk şer bikin.' Sedema wê çibû?***

Charles Faedes: Wê demê rewş ne zêde baş bû, ev jî ne kirdareke yek kesî bû. Ji ber kirdarên hikûmetan serbaz û berpirsên herdû aliyan diketin rewşekî xirab û piraniya caran jî ew guşar, hevrikî û berjewendiyên niştimanî dibûn sedem ku ew nakokî çêbibin.

***Rûdaw: We di pirtûka xwe de nivîsî bû ku belgeyên we hebûn Qaîde li navçeya Xurmal û Serget çekên kîmyayî dirust dikirin, belgeya we çibû?***

Charles Faedes: Sixurên me di nav kargehan de hebûn.

***Rûdaw: Di wê dema hûn li Kurdistanê bûn, qet pirsgirêkek di navbera we û Kurdan de çêbû?***

Charles Faedes: Nexêr, tu pirsgirêkeke min li gel Kurdan nebû.

# Rêjîma Suriyê reng û stranên Kurdî qedexe kir

**Qamişlo (Rûdaw) –** Rejîma Sûrî di ahengan de bikaranîna ala Kurd, rengên Kurdî û stranên kurdî qedexe kir. Li gor agahiyan demekî berê li Qamişloyê hêzên ewlekariyê xwediyên salonên ahengan komkirine û vê biryarê daxuyandine.

Di salên dawî de aheng, zemawend an jî çalakiyên Kurdên Suriyê bê bilindkirina ala Kurd ya neteweyî derbas nebûye. Bi taybetî piştî Şerê Iraqê û serkeftina Kurdan li Iraqê nîşana neteweyî ya Kurd derbasî jiyana rojane ya Kurdên Suriyê bûye. Di dema Serhildana Adara 2004an de êdî tirsa hildana ala Kurd hat şikandin. Herçend destûra Suriyê Kurdan napejirîne û hertiştê kurdî li Suriyê qedexe ye jî Kurd êdî guh nadin qedexeyên rejîmê.



Dezgeha ewlekariyê li Qamişloyê berî demekî xwediyê salonên ahengan komkirin û biryara qedexeya reng û ala Kurd û stranên kurdî ragehandin. Xwediyê saloneke mezin yê agangan li Qamişloyê ji Rûdawê re wiha axifî: "Berpirsê ewlekariya siyasî ji me xwest ku em di ahengan de rê nedin stranbêjan ku stranên neteweyî yên kurdî pêşkêş bikin. Ji bilî hildana ala Kurd herweha rengên kesk û sor û zer jî qedexe kirin."

Li aliyê din piraniya xwediyê salonan guh nadin fermana dezgeha ewlekariyê. Di rojên dawî de li Qamişloyê komekî ahengên zemawendan pêk hatin û li hemuyan ala Kurd hat hildan. Ji ber ku ev dem mewsimê dawetan e, xwediyên salonan naxwazin zibûnên xwe aciz bikin û ji vê yekê re çavên xwe digirin. Xwediyê saloneke li Qamişloyê jî bahsa pirsgirêkên bi muşteriyên xwe re dike: "Em nikarin xelkê mecbûrê tiştekî bikin ku ew nexwazin. Eger ez hildana ala Kurd qedexe bikim, ewê biçin cîhekî din zemawenda xwe pêk binin."

Hea niha jî ber mesela rengên ala Kurd ya neteweyî ti kêşe çênebûne. Xwediyên salonan hêvî dikin ku ew bikaribin bi bertîlan hêzên ewlekariyê razî bikin, da ku rê li ber hildana al û rengên kurdî negirin.

# Awûstûrya li Başûrê Kurdistanê reya hesinî çêdike

**Wiyana (Rûdaw) -** Holdînga Awûstûryayî Sunshine Invest SE (SISE), ku holdîngeki bi projeyên li Iraqê mijûl e, li Başûrê Kurdistanê reyek hêsinî bi dirêjiya 537 km ava dike. Reya hêsinî di navbera Dihok, Hewlêr û Silêmaniyê tê avakirin û heta sînorê Iranê dirêj dibe. Li gor peymanê armanc ew e ku proje bi wergirtina neftê bê fînanskirin.

Li gor daxuyaniya holdînga ku bingeha wê li Brukselê ye, bihaya projeyê di navbera 1,2 – 2 milyar Euro de ye. SISE ku niha xwedî 600 karmend e, di sala 2005an de li gor qanûnên Ewrûpî hatiye sazkirin û bêhtir bi karên li Başûrê Kurdistanê mijûl e. Holdînga SISE li Dewletên Yekgirtî yên Amerîkayê (DYA), Israîl û Komara Sirbistanê jî projeyan pêktîne.



# Pêwîstiya Kurdên Rojhilat bi DTP'yekê heye

**Bîlal Seîd**

**Taybet (Rûdaw) -** Çalakvan û siyasetvanên Rojhilatê Kurdistanê dibêjin ku pewistiya wan jî li Iranê bi partiyeke Kurdî ya desturî, wek Partiya Civaka Demokratîk (DTP) li Bakûrê Kurdistanê, heye. Lê ew dibêjin ku yasayên Komara Islamî ya Iranê rê ji partiyeke bi wê şêweyê nadin.

Sistema siyasî ya Iranê jî dû eniyên sereke yên reformxwaz û kevneperestan pêk tê. Herçend ku çend partiyên Şiiyan li Iranê hene jî, di siyasetê de roleke wan ya berbiçav tune ye.

Berdevkê Eniya Yekgirtî ya Kurd, Dr. Rehîm Ferehmend, di wê baweriyê de ye ku desthilata Iranê astengiyan li hember avabûna partiyeke Kurd li Iranê, mîna DTP'ya Bakûrê Kurdistanê ku jî bo mafên Kurdan li wî welatî bixebite, derdixê: "Iran di wê baweriyê de ye ku avabûna partiyeke Kurd dê bibe sedemê cudabûna Kurdan." Li gor dîtina navhatî, "rewşa Tirkiye û Iranê gelekî jî hev cudaye. Tirkiye gelek hewldide ku bibe endamê Yekîtiya Awrûpayê, lewma rê jî partiyên Kurdî re vedike, lê li Iranê ne wiha ye."

Eniya Yekgirtî ya Kurd ku bi serpereştiya siyasetvan û sermayedarê Kurd, Behaedîn Edeb û hejmareke kesatiyên Kurd li Tehranê hat ragihandin, jî bo ku bibe partiyeke siyasî ya destûrî, serî li dezgehên pêwendîdar da, lê destûr nehat dayin.

Iran ne tenê rê jî bo avakirina partiyeke Kurdî digre, lê ew gelek caran rê li avakirina partiyên mezheba Şiiyan jî digrin. Endamê berê yê parlamentoyê û endamê Partiya Muşareketi Islamî Iran, Celal Celalizade di wê baweriyê de ye ku "astengiyên desthilatê yên jî bo avabûna partiyeke siyasî ya Kurdî pir in, ji ber ku niha rê jî partiyên mezhebî jî re naye dayin."

> **"Iran di wê baweriyê de ye ku avabûna partiyeke Kurd wê bibe sedemê cudabûna Kurdan."**

Wek ku çalakvanên siyasî didin xwiyakirin, jî bo damezrandina partiyeke Kurdî ya destûrî li Iranê gelek hewil hatine dayin, lê yek jî wan hewlan jî biserneketiye. Ne damezrandina Partiya Aşitî û Azadî li serdema Xatemî û ne jî ya Eniya Yekgirtî ya Kurd.

Partiyên opozisyona Rojhilatê Kurdistanê dibînin ku damezrandina partiyeke destûrî li jêr siya desthilata Komara Islamî ya Iranê, tiştekî zehmet e. Lê ew partî bixwe jî ne li derveyî rexnegirtinê ne û siyasetvan dibêjin ku siyaseta karkirina wan partiyên opozisyonê ne diyare û wan jî bo damezrandina partiyeke destûrî hewil nedane.


Rojnamevan û çalakvanê siyasî Xalid Tewekulî di wê baweriyê de ye ku "helwesta partiyên Kurdî ya di derbarê çalakiyên destûrî li Rojhilatê Kurdistanê û programa wan ya jî bo meşandina riyên destûrî û rêgirtina li tundûtujiyan, ne diyarin. Divê partiyên Kurdî xwe yekalî bikin."

Peyivdarê Eniya Yekgirtî ya Kurd, Dr. Rehîm li ser vê mijarê fikrên xwe wiha tînê ziman: "Ji bo şertûmercên dirustkirina partiyeke siyasî-destûrî li Kurdistana Iranê, partiyên Kurdî xwe yekalî nekirine, divê ew hizra vê meseleyê bikin, ji ber ku niha şertûmerc hatiye guhertin û divê hebûna me li hundirê welat hebe, ne tenê em hizra opozisyonê bikin, belkî divê em hizra beşdarikirinê jî bikin."

Rehîm herwiha rexne li hevwelatiyên Kurd jî girtin ku girîngiyê bi mijarên siyasî nadin, wî hilbijartinên Serokatiya Iranê yên vê dawiyê kirin mînak û got. "Li hemû bajar û kolanên Iranê herkesî behsa hilbijartinan dikir, lê Kurdan nikaribûn li hev bikin ka dengên xwe bidin kê."

Di gera heftem ya hilbijartinên serokkomarê Iranê de, piştî şoreşa Islamî ya sala 1979an cara yekem li Iranê Kurd bûne karta hilbijartinan û berendamên serokatiya komarê bi eşkere behsa Kurdan kirin. Beriya hemûyan jî Mehdî Kerûbî ku di karnameya xwe ya heşt xalî de, ya jî bo çareserkirina pirsgirêka kêmnetewên Iranê, wî bi taybetî behsa Kurdan kir. Her yek jî Partiya Azadiya Kurdistanê û Hizba Demokrata Kurdistana Iranê (baskê Ebdulla Hesen Zade) piştevaniya programa Kerûbî kirin û daxwaz jî xelkê kirin ku tevlî hilbijartinan bibin. Lê gelek dengderên Kurd li Silêmaniyê dengên xwe dane Ehmedî Nejad û di encam de jî her ew bi serket û Kerûbî nikaribû gelek dengan bidest bixe.

> **"Niha proseya hilbijartinan û faktorên peywendîdar rewşekî siyasî pêkanîne ku berendam neçar bûn beşeke daxwaziyên Kurdan û neteweyên din yên bindestên Iranê bixin nav programa xwe ya hilbijartinan.**



Sekrêterê Partiya Azadiya Kurdistanê Hisên Yezdanpena dibêje, berevajî hemû partiyen opozisyonê yên Iranê, ew hizra hebûna partiyeke destûrî li Iranê dike û dibêje: "Niha proseya hilbijartinan û faktorên peywendîdar rewşekî siyasî pêkanîne ku berendam neçar bûn beşeke daxwaziyên Kurdan û neteweyên din yên bindestên Iranê bixin nav programa xwe ya hilbijartinan. Lewma niha dema damezrandina partiyeke siyasî, destûrî ya Kurdî ye. Niha demeke baş e ku reformxwazan û bi taybetî Kerûbî bixin jêr givaştinan, ku soza wê yekê bide, ku rê li pêkanîna partiyeke Kurdî ya Kurdî ya sayî negire, eger ew biserkevin."

Di derbarê awayê wê partiya destûrî de, Yezdanpena dibêje: "Eger ew partî hat damezrandin, nabe girêdayî dewletê bê, pêwîst e peywendiyên neyênî digel saziyên sixuriyê nebê. Di heman demê de nabe jî bo helwestên radîkal û tund, ew jî aliyê hêzên siyasî yên Kurdistanê bikeve bin givaştinan. Herwiha nabe ew xwe weke cihgira hêzên bizava rizgarîxwaza Kurdistanê bibînê, lê divê em herdû alî hevdû temam bikin."

Di derbarê birûbaweriya endamên wan li ser partiyekî destûrî li Iranê, Yezdanpena got: "Me daxwaz jî endamên xwe yên hundirê welat kiriye ku ew piştevaniya hemû hewldanên siyasî yên li nava welat bikin yên ku jî bona dirustkirina partiyeke siyasî-destûrî li Rojhilatê Kurdistanê dixebitin."

www.arsivakurd.org

# Rûsya bi kurdî diaxife

**Kamiz Şeddadi**

**Moskow (Rûdaw) –** Radyoya Rûsyayê ku heta niha bi 38 zimanan weşana xwe dikir, niha jî bi Kurdî weşanê dike. Bernameya Kurdî ya yeksaetî ku ji radyoyê “Dengê Rûsyayê” rojane tê belavkirin, dikarê li Kurdistanê jî bê guhdarkirin. Radyoya “Dengê Azadiyê” di heftê salên desthilata Yekîtiya Sovyetê bi angaşta “Dengê Bindestan” bi 70 zîmanî weşan dikir, lê Kurdî hatibû jibîrkirin. Di destpêka sedsala 21an radyoya Dengê Rûsyayê pêwistî bi weşana bi nêzîkî 40'ê ji wan zimanan nedît û weşana wan rawestand, lê weşana bi zimanê Kurdî li listeya xwe zêde kir. Rûsyayê çima pêwistî bi wê yekê dît ku dengê xwe bighînê Kurdan? Anjî bi awayekî din, Moskowê çima dest bi axaftina Kurdî kir? Berpirsê beşa Kurdî ya radyoya “Dengê Rûsyayê” Dr. Beşîr Sebrî pirsên me bersivandin.



***Rûdaw: Moskowê çima û çawa biryara weşana Kurdî da? Gelo ji dema siyaseta wan ya Sovyetê çi guherî?***


Dr. Beşîr Sebrî: Cîhan guherî û Kurdan jî dewletên ku li nav sînorên wan dijîn mecbûrî guhertinan kirin. Rûsya jî gihiştiye wê bawerîyê ku divê Kurd jî xeta siyaseta Moskowê nas bikin. Bila bala we bikşînê, radyoya Dengê Rûsyayê berê bi 70 zimanan weşana xwe dikir. Heta niha weşana bi 40 zimanan hat rawestandin, lê ya bi Kurdi nû dest bi weşanê kir. Evyek jî tê wê wateyê ku dewletên cîhanê hesabê Kurdan weke netewe dikin.

***Rûdaw: We bingeha weşana Kurdî di Radyoya Rûsan de çawa pêk anî. Hun di kijan astê de tevlî projeyê bûn?***

Dr. Beşîr Sebrî: Amadekariyên weşanê di Gelawêja 2007an hatin destpêkirin. Astengiyên ku di dema bijartina xebatkaran hatin jiyandin, demekî dirêj girt. Herî kêm 50 kesî ji bo xebatê têkilî danîn, lê yek ji wan jî ne di wê astê debû ku nîvîsan bi profesyonelî ji Rûsî wergerînê Kurdî. Serlêdanên hemuyan ji bo xwendina gotaran û spîkerîyê bûn. Herî dawî têkilî bi min re danîn û min jî qebûl kir.

Demêk dirêj bi amadekirinan derbas bû û di 19ê Gulana 2008 an beşa Kurdî bi fermî dest bi weşanê kir.

Weşana xwe em bi zaravayê Kurmancî dikin. Weke ku tê zanîn li Kurdistanê û li derveyî Kurdistanê bêtirî 25 milyon Kurd bi zaravayê Kurmancî diaxifin. Li welatên ku Kurd lê dijîn evyek qedexe ye. Ev faktor bi serê xwe nîşana wêyekê ye, bê Kurmancî di bin tehdîtekî çawa mezin deye. Pirsgirêka me ya bingehîn jî dîtina xebatkarên ku hem Kurdî û hem jî Rûsî zanibin bû. Tevî hemû astengiyên pêşiya Kurdî, dîsa jî cîhan Kurdî dibihîsê. Di dawiya dawî de Moskowê jî dest bi axaftina Kurdî kir!



Bernameyên me bi frekransa 4149 li ser pêla kin berbi Kurdistanê tên weşandin. Lê vêgavê deng hinekî lawaz e û guhdarvanên me li her derê nikarin li me guhdar bikin. Ji bo çareserkirna vê pirsgirêkê me bi hevkariya şirketekî înglîzî ji 11'ê Sermaweza 2008an û şûnde li başûrê Kurdistanê dest bi weşana li ser pela FM'ê kir. Niha li Hewlêr, Dihok, Silêmanî û Kerkûkê bi hêsanî dikarê li ser pêla FM li me bê guhdarkirin.

Em rojane saetekê bi dema Moskowê (dema Moskow û Hewlêrê yeke) di navbera demjimêr 20.00–21.00 weşanê dikin. Rojane saet di navbera 11.00–12.00 de bernameya roja borî tê dubarekirin. Wekî din li ser malpera me ya bi navê www.golos-rossii.ru jî guhdarvan dikarin li me guhdar bikin.

Weke ku we jî behs kir radyoya Dengê Rûsyayê bi 38 zimanan weşanê dike. Wekî hemû radyoyên giştî, yê me jî pêşveçûnên siyasî, civakî, çandî û aborî li cîhan û Rusyayê ji xwe re dike mijar. Wekî din em bernameyan li ser dîrok, wêje, folklor û bi giştî çanda Kurdan amade dikin. Rêzeweşana me li ser “Dîroka wêjeya Kurdî”, ku me beriya niha bi demekê dest pê kir, yek ji wan mînaka ye. Rêzeweşan ji 18-19 beşan pêk tê. Vê gavê em beşekî li ser Ahmedê Xanî amade dikin. Dîsa di bernameya “Panorama Hefteyê” em herêmên cûda yên Rûsyayê din nasandin.

***Rûdaw: Ez bawer dikim ku Radyoya Dengê Rûsyayê ji aliyê pirzimanî li cîhane yek ji yên hêrî dewlemend e. Hûn karin hinekî behsa awayê weşana radyoyê bikin?***

Dr. Beşîr Sebrî: Materyalê weşanê yê 38 zimanan ji navendê tê. Hemû şîrove û nûçe ji yek navendê tên belavkirin. Hemû beşên radyoyê hema bêje heman meteryalî distînin û wergerînin bo zimanê xwe yê weşanê. Materyalê ku ji mere tê, ji Filistîniyan, Portekîzan û Hindiyan jî diçê û bêgûman her beşek ji bo xwe xeteki weşanê durust nake. Yani Rûsya xwe û siyaseta xwe didê naskirin. Weke ji navê wê jî eşkere dibe, dengê Rûsyayê ye. Lê dîsa jî zanibin ku em mîna papaxanan her peyvê dûbare nakin. Em bi armanca weşanekî ji bo Kurdan derketine ser riya xwe. Eger em bûyerên siyasî û yên din ku bi Kurdistanê eleqedarin û çand, weje û folklora Kurdan bînin bîra xwe, wê gavê weşanekî ku ji ya zimanên din cûdatir derdikevê pêş.

Beşekî din ji weşana me mûzîke. Herçiqas bernameyên kêf û mûzîkê nebin jî, em giringiyê didin mûzîka Kurdî. Giraniya mûzîka ku em diweşînin ji arşîfên Radyoya Rêwanê ye. Carcaran em cih didin mûzîka hunermendên nûjen jî.

***Rûdaw: Hûn dibêjin bila Kurd jî hinekî fêrî guhdarkirina zimanê xwe bibe?***

Dr. Beşir Sebrî: Çi televîzyon çi jî radyo, tu kijan kanalên Kurdî vekê, tuyê bi giranî rastî mûzîka bi ritim bê, yanî mûzîka govendê. Em jî giringiyekî mezin didin dengên zêrîn yên mûzîka Kurdî ya gelerî, mîna dengên Ayşe Şan û Mehmed Arifê Cizîrî. Di civîna xwe ya dawî de me biryar da ku em di pêşerojê de giraniyê bidin mûzîka hunermendên nûjen. Di arşîfên me de bi îhtimal derdora 6 hezar parçeyên Kurdî yên tomarkirî hene. Ez di wê baweriyê deme ku guhdarên mê wê vêyekê biecibînin. Xebatkarên me bi giranî kesên ciwan in, yê di nav wan de emirdirêj tenê ez im. Em bi giştî 12 xebatkarin. 9 ji wan hertim di studyoyê de dixebitin, sê yên din jî nûçeginanên me yên derve ne. Du ji wan jin û du jî mêr, bi giştî çar spikerên me hene û du kes jî li ser karên wergerê dixebitin û her sê kesên din jî bi amadekirina bernameyan mijûlin. Di demek kin de emê bernameyên li ser klasîkên Rûsî mîna Tolstoy, Puşkîn, Dobrolyubov, Çernişevskî û Çehov biweşînin.

***Rûdaw: Reqabeta we bi “Dengê Amerîkayê” beşa Kurdî re heye?***

Dr. Beşîr Sebrî: Dengê Amerîkayê çar demjimêran weşanê dike. Xetekî radyoyê ya azad heye û bêgûman evyek jî sîyaseta Amerîkayê ye. Siyaseta her dewletekî di weşana wê de xwe dide xwiyakirin. Çawa siyaseta ku Amerîka li hemberî Kurdan dimeşînê ji ya Rûsyayê cûda ye, weşana wan jî cuda ye. Tenê tiştê ku me û “Dengê Amerîkayê” dike raqîb, ziman e. Di aliyê ziman de ew bi îddia ne û Kurdiyekî baş bikar tînin.

***Rûdaw: Di bernameya we de weşana bi zaravayê Dimilî heye?***

Dr. Beşîr Sebrî: Niha em tu guhertinên ciddî plan nakîn. Di vî warî de pêwistî bi profesyoneliyekî hîn mezintir, bi zanebûnekî mezintir ya bicihanînê heye. Daxwaza me ya weşana Soranî û Dimilî heye. Bêgûman biserketina daxwazên me bidîtina karmendan girêdayiye. Vêgavê bi wan kadroyên meyî heyî tenê em dikarin rojane saetekî weşanê bikin. Eger di pêşerojê de rewş biguherê, naverok jî diguherê.

# ‘Li Sûdanê gelek Kurd hene‘

**Nûredîn Weysî**

**Hewlêr (Rûdaw) –** Di hevpeyivîneke ligel Rûdaw de Serokwezîrê Sûdan yê berê Sadiq El-Ehmedî bahsa welatê xwe dike û dibêje li Sûdanê komek Kurd hene û mêrê keça mamê wî jî Kurd e. Li gor El-Ehmedî Kurdê Sûdanê ‘rêvendekê’ pêk naynin, lê komekî Kurd li welatê wan hene. El Ahmedî di derbarê Kurdên Sûdanê de pirsên me bersivand.



***Rûdaw: Tê gotin ku Kurd hene li Sûdanê?***

El-Ehmedî: Belê li Sûdanê binemalên Kurdî hene, lê ez nikarim bêjim rêvenda Kurdî heye. Herçiqas li welatê gelek binemalên Kurdî hene ku paşnavên wan ‘El-Kurdî’ ye. Bo mînak hevserê keça mamê min navê wî Evdilrehman El-Kurdî ye. Yên hanê koçkirine hatine Sûdan.

***Rûdaw: Hûn çawa temaşa ezmûna desthilata Kurd dikin?***

El-Ehmedî: Ez ezmûna Kurd li vê herêmê wekî destkeftiyeke ji bo Kurdan dibînim. Ezmûneke geşkirî ye û baweriya wê bi xwe heye û ezmûneke liserxwe ye jî. Bo mînak tevî wan tiştên ku di raboriyê de rû dane hemû ku Kurd di 1991an de dikariyan reyeke cuda deynin ber xwe. Dîsa jî reya yekgirtinê bi beşên dî yên Îraqê danî ber xwe. Herwiha Kurd helwêsteke tolhildêr li hemberî wan Îraqiyên ku li vir bûn nîşan nedan. Ji ber vîqasî ev liserxwebûn sedema serkeftina Kurd e. Serokên Kurd heta niha jî bi awayekî liserxwe qise dikin. Li aliyekî xeteke wan ya sor mafên wan e, lê ji aliyê dî ve jî xeta wan a sor yekgirtin û hevkarî ligel xelkên dî ye.

***Rûdaw: Niha serokê Sûdanê ji aliyê Dadgeha Tawanî ya Navnetewî (ICC) ve tê darezandin ji ber tevkujiya xelkê Darfûr. Helwêsta we çî ye?***

El-Ehmedî: Bi baweriya min tevkujî rûnedaye, belkî tawanên cengî û tawanên dijî mirovayetî hatine encamdan. Em li gel Dadgeha Navnetewî ne. Bo agahdariya we, Dadgeha Tawanî ya Navnetewî ji wan rûdanan re negotiye tevkujî, lê wek tawanên cengî û tawanên dijî mirovayetiyê dîtiye.

# Di hilbijartinên Almanya de berendamên Kurd nînin

**Rûdaw (Berlin) –** Berendamên Kurd îsal tevlî hilbijartinên Almanya nabin. Li Almanya di 27ê Îlona 2009an de hilbijartinên giştî pêk tên. Partîyên Alman yên wek partîyên kevneparêz CDU û CSU, Partîya Sosyal Demokrat (SPD), Partîya Kesk Bündnis 90/Die Grünen, Partîya Lîberal (FDP) û Partîya Çep (Dîe Linke) jo bo hilbijartinê kongreyên xwe jî lidarxistin. Di kongreyan de stratejîyên hilbijartinê tên destnîşankirin. Heta niha navê endamên Kurd nehatine pêşkeşkirin. Di hilbijartinên borî de çend berendamên Kurd tevlî hilbijartinan bûbûn.


Ji bo parlamentoya federal (Bundestag) 603 endam tên hilbijartin.

Li aliyê din di nav partîyên Alman da ji bo endamtiya Bundestagê namzedên Kurd nehatinê destnîşankirin. Kurdên ku nav partiyên Alman da dixebatin, helwesta partîyên Alman rexnedikin û dibijen; “Li Almanya derdora 400 sed hezar dengên Kurdan heye. Hemû karûbarê me bê encam ma Li me neheqî dikin. Ji bo hilbijartinên paşerojê divê em îro dest xebatê bikin. “

Parlamenê Kurd yê Partîya Çep Giyasettin Sayan, partîyên ku ji bo Bundestagê nebûna berendamên Kurd, wek kêmasîya Kurdan dibinê: “Em Kurd sîyaseta Almanan zêde fahmnakin û dikewin şaşîyê. Dema ku me sîyaseta Alman baş fahmkir û hingê emê serbikevin.“

Kevneparlamenê Partîya Kesk Rıza Baran jî wiha dibêje; “Li Almanya civakeke dînamîk yê Kurdan heye. Di paşerojê de Kurd li sîyaseta Alman da serbikevin û wê têkevin Bundestagê.”

Di hilbijartina meclîsa federal de 62,2 milyon hilbijêr dengê xwe bikartînin. Ji van hilbijêran 32 milyon 200 hezar mêr û 30 milyon jî jinin.



# Xwendekarên Kurd li Berlînê komela Nûbar avakirin

**Berlîn (Rûdaw) –** Xwendekarên ciwan yên Kurd li paytexta Almanya Berlînê komelekî bi navê Nûbar sazkirin. Ji ber avakirina Nûbarê, li Zanîngeha Teknîk ya Berlînê pîrozbahiyekî hat lidarxistin û derdora 60 xwendekar, zanyar û dostên Kurdan beşdar bûn.

Di pîrozbahiyê de Prof. Dr. Birgit Amman axafî. Birgit Amman di axaftina xwe de li ser Kurdên diyasporayê rawestiya: “Êdî Kurdên diyasporayê jî rêxistinên xwe avadikin û li derveyî welatê xwe bune xwedî gelekî mafan. Xwendekar û zanyarên Kurd ji bo ku pirsgirêkên Kurdan bi civaka Almanyayê bidin nasandin ev gav avêtine û ez bawerdikim ku ewê ji bo civaka Kurd li Almanyayê di peşerojê de tiştên pir baş bikin û civaka Kurdan baş bidin nasandin.”

Di pîrozbahiyê de Mamosteyê Kurdî Evdila Dirêj jî axifî û balê kişand ser xebata ciwanên Kurd li dîyasporayê: “Ji bo ku ciwanên Kurd li Almanyayê xwe baş perwerde bikin û xwedî li pirsgirêkên xwê yên sîyasî û civakî derkevin, gavekî wiha avêtine û ev jî tiştekî erênî ye. “

www.arsivakurd.org

# Ajandeya Hefteyê

## Li Berlînê 'Evîn ne lal e'





**Berlîn -** 9ê Tîrmehê fîlma derhênerê Kurd Şêrwan Abdulmajid ya bi navê "Evîn ist nicht stumm / Evîn ne lal e" li Volt-Culture Bewohnertreff tê nîşandan.
Fîlm li ser rewşa biyaniyên li Berlînê û pirsgirêkên wan yên rojane bi taybetî di hêla nazanîna zimanê almanî de radixîne ber çavan.
Cih: Volt-Cültüre Bewohnertreff e.V.
Navnîşan: Voltastr.33,13355 Berlin-Wedding, S-/U-Bahn 8 Voltastraße.
Saet: 19.00 (Derbasbûn belaş e!)

## Li Tetwanê mîhrîcana çand û hunerê

**Tetwan -** Li bajarê Tetwanê di 30ê Hezîranê de mîhrîcana çand û hunerê destpêkir û wê heta 19ê Tîrmehê bidome. Di çarçova mîhrîcanê de ji bilî panel, şano, pêşengeh û fîlman wê hunermendên wek Rojda, Ferhat Tunç, Diyar, Xemgîn Bîrhat, Koma Azad beşdar bibin û stranên xwe pêşkêşî Tetwaniyan bikin.
Li Tetwanê di hilbijartina dawî de DTP bi ser ketibû û Avdullah Ok bûbû şaredar.
Pêwendî: www.tatvan.net/fuar/

## Fîlmên Yılmaz Güney li Stenbolê ne




**Stenbol -** 10 fîlmên Yılmaz Güney yên ku hatine nûkirin wê heta 16ê Tîrmehê li benda sînemahezan be. Fîlmên wek 'Rê, Heval, Seyîdxan, Hêvî, Kerî, Gurên Birçî' wê li sînemeya Beyoğlu ya Stenbolê bên nîşandan.

## Pêşbaziya wêjeyî ya Huseyin Çelebi

**Köln -** Pêşbaziya wêjeyî ya Çîrok û Helbestan ya Huseyin Çelebi destpêkir û li benda berhemên we ye. Wêjehezên ku dixwazin beşdar bibin divê heta 1.09.2009an çîrok û helbestên xwe bişînin ber destê komîteya amadekar.
Pêşbaziya Çîrok û Helbestan ya Huseyîn Çelebî ji aliyê Yekîtiya Xwendekarên Kurdistanê (YXK) ve ev 17 sal in tê lidarxistin. Pêşbaziya ku di nav wêjeya kurdî de pêşbaziya herî temendirêj e ji bo bîranîna Huseyin Çelebi li ser navê wî tê lidarxistin. Pêşbazî bi kurdî (kurmancî-zazakî) û tirkî ye.
Pêwendî:
h.celebi2009@hotmail.de


## Li Berlîn û Hamburgê şanoya kurdî

**Hamburg -** Şanoya şaredariya Amedê di rojên 09-11ê Tîrmehê li Berlînê û 12-13ê Tîrmehê jî li Hamburga Almanyayê bi hevkariya Yek-Komê derdikeve ser sehneyê. Şanogerên ku ji Amedê tên dê lîstikên xwe ên 'Mala Dînan' û 'Yaşar ne dijî ne jî najî' ve derkevin hemberî şanohezên li Berlîn û Hamburgê.



Cih: Prinzenstr. 1, 10969 Berlin
saet: 19.30
Mengestraße 20, 21107 Hamburg
saet: 19.30

## CD'ya Hemê Hacî 'Dewrê' derket




**Nawenda Nûçeyan -** Albûma nû ya stranbêjê kurd Hemê Hacî ya bi navê 'Dewrê' piştî ku li Ewrûpayê ji alî Mîr Mûzîk ve derketibû, niha jî li Stenbolê ji Kom Mûzîkê derket.
Hunermend Hacî di vê albûma xwe de bi dengê xwe yî xweş ve stranên wekî 'Dewrê, Çit Lê Lê, Kekê Min, Yarê, Hemo Lo Lawo, Ay Lê Çemay, Sila' distrîne.
Derhêneriya mûzîkê ya albûma dewrê Şafak Bozacıoglu kiriye. Hemê Hecî di vê albûma xwe de stranên Şakiro, Dengbêj Reşo û Eyşe Şanê ji bi deng û awaza xwe ve ji nû ve distre.
Stranbêjê ku di 1967an de hatiye dinyayê, heta niha albûmên wekî 'Dayê Dayê, Meşa Azadiyê, Huner, Strana Hekîmê Serhedê' derxistibû.

# "Destê xwe bavêjên benê ziman!"

**Evdile Koçer**

**Taybet -** Komeleya Nivîskarên Kurd ya li Amedê ev çendek e bi kar û barên xwe ve bala raya Kurd dikişîne ser xwe. Komeleya ku xwedî 110 endamî ye, ji alî rewşenbîriya Kurd ve jî bi mereq tê şopandin. Ji bo ku em bersiva çend pirsan werbigirin me xwe gihand berdevkê komelê nivîskarê naskirî birêz Arjen Arî.



***Rûdaw: Kekê Arjen, tu dikarî ji me re hinekî behsa kronolojî û rabirdûya Komela Nivîskarên Kurd bikî?***

Arjen Arî: Bi kêfxweşî...Komela me, komela ku di destpêkê de bi navê Pena Kurd ji layê heft kesan: Samî Tan, Sedat Yurtdaş, Suzan Samanci, Serkeft Botan, Yildiz Çakar, Edîp Polat û Arjen Arî ve di sala 2004an de hat damezrandin di komcivîna xwe ya 2.de ji ber dijderketina Navenda Pena Kurd- piştî damezrandinê 'navend' anîn pêşiya navê xwe- û li ser daxwaza Pena Navneteweyî neçar ma ku navê xwe biguhere bike Komeleya Nivîskarên Kurd li Amedê!

Weke agahî; ji sala 1908ê ve li ser axa Tirkiyeyê bi navê Kurd tu sazî,dezgeh, komele nehatina damezrandin. Dîsa, bi qasî ku 20 nivîskarên xwedî berhem, li tevî jînenigariya xwe serî li Pena Navneteweyî dan, ji ber astenkirina Navenda Pena Kurd, Pena Navnetewî rê neda ku em weke Pen xwe li welêt damezrînin, saz bikin... Serencama damezrandina Komeleyeke Nivîskaran digihêje biryara Civîna li Îzmîrê ya sala 2001ê.

***Rûdaw: Gelo rewşa we çi ye, heta niha çend endamên we hene?***

Arjen Arî: Di van 5 salên derbasbûyî de, bi qasî ku jimara endaman gihişt 110 an, hê nû par em bi alîkariya du kurdên welat û wêjeperwer- ku herdu jî li Almanya dijîn- bûn xwedî war û cih. Beriya vê baregehê, komele di avahiya Enstituya Kurdî ya Amedê de di 'xurfeyekê' de 'mêvan' bû!

***Rûdaw: Rol û cihê Kurdên tirkînûs di komelê de çawa ye ezbenî?***

Arjen Arî: Roja ku komele damezriya, pirsa' nivîskarê Kurd kî ye' jî bi xwe re anî.

Lê ev pirs, yanî 'pirsa nivîskarê Kurd kî ye' ji hêla nivîskarên ku ji serdema Birabozê şaîr de bi zimanê bavûkalan aldariya 'alema kelamê mewzûn' dikin; eşkere ye diyar e! Ev gengeşe di qada wejeya gerdûnî de mîadê xwe dagirtiye, lê di nava kurdan de hê jî weke 'kayeke kevn' tê dêrandin!

Di nava komeleyê de îro jî kurdên ku bi tirkî dinivîsin hene,û ew weke rêje digihijin ji sedî 20ê. Lê çi weke komele, çi jî weke rêveberî tu pirsgirêka me ya aîdiyetê nîne; lê di biwarê temsîliyetê de bîrûboçûnên cuda-cihê hebin jî; nivîskarên ku bi tirkî dinivîsin ne xwedî kartek in di kargerî û rêveberiya komeleyê de...

***Rûdaw: Komele çi tesîrê li ser nivîs û nivîskariya kurdî dike?***

Arjen Arî: Ji ber ku nivîskarî û komelgerî du warê cuda ne, Komele dixwaze weke mala hemû nivîskaran bilive, tevbigere.

Daxwaza me ya sereke ev e, ku em ji nivîskaran wirvetir di navbera wêje û derûdorê de bibin pirek, ku ev jî dê pêşiyê li ziman, li kirîn û firotina berhemên kurdî, li çapkirin û wêşandina berhemên kurdî veke.

Bi taybet, di van demên dawî de Nivîskarên Girtî dixwazin berhemên xwe bi riya Komeleyê biweşînin. Heta niha du berhem hatine hilbijartin bo weşandinê. Me dil heye ku serê payîzê herdu berheman bidin çapê. Rûdana herî darîçav a Komeleyê ew e; di qedexedariya ku rêveberiya girtîgehan danîbû ser berhemên kurdî bi têkildanîna bi nivîskarên di 'hundir' de li gelek cihan rabû. Minak Girtîgeha Sêrtê! Rayedarên dewleta Tirkî di her delîveyê de bibijên 'qedexe rabûye jî'; em ji name û çavdêriyên xismên girtiyan têderdixin ku ev qedexadarî û astenkirin berdewam e. Ji lew, em dixwazin di demeke nêz de bi şewr û piştgiriya Pena Tirk, Sendikeya Nivîskarên Tirk û hevkariya saziyên çandî-hunerî vê babeta girîng hilgirin rojava raya giştî, ya li hûndir û ya li der

***Rûdaw: Gelo têkiliyên we bi siyaset û partiyên kurdan re çawa ye?***

Arjen Arî: Wek ku me di peyva xwe ya 'êvareya xwarinê ya bi Osman Baydemîr re jî anî zimên; em rêzê digirin li hemû bîr û baweriyên siyasî, û partiyên eşkere an nepen... Lê em xwe nêzî her bîrdozê, û bi qasî vê nezîkahiyê dûrî her bîrdozê dibînin û digirin...

Em ji van destkeftiyan ne bi gazinc in, û tu giliyê me jî nîne.

Rexneya me ya sereke ev e, em weke Komele dixwazin ku hemû derûdor, hemû rex û alî destê xwe bavêjên 'benê ziman'! Ji ber ku 'benê ziman' serê benê azadiyê ye. Û em tev li dû bidestveanîna vê azadiyê ne...

***Rûdaw: Belê, gelo çi plan û proje li pêşiya we ne?***

Arjen Arî: Niha di rojeva me de serdana Kurdistanê, di meha Îlonê de yadkirina Qenetê Kurdo, di nîvîsê de 30 saliya Arjen Arî heye...


Ji bilî vana; weke Komele pêwendiyên me li gel Şaredariyan berdewam in û ta niha bi alîkariya diravî ya Şeredariya Baglar, û Kayapinarê û desteka Enstîtuya Kurdî ya Amedê a teknîkî pirtûkên zarokan yên bi wêne, çîrokên gelerî hatine çap kirin. Kitêba Aram Gernas ya ku ji aliyê Şaredariya Serbajêr ve hate çapkirin bi pêşniyaz û erêkirina Komeleyê hat weşandin...

Û me sozine qewî sitendin ji rêzdar Osman Baydemîr. Niha, Komele bo ku bazara kesat a berhemên kurdî geş bike, hewldide ku xwe bigihîne 99 şaredariyan, û ji wan daxwaz bike, ji her pirtuka kurdî di ser destê Komeleyê re 10 daneyan bikirin, ku ev jî dike 990 dane.

# "Dawiya bê dawî" û siûd kîkî

Dawiya Bê Dawî, Siûd Kîkî
Weşanxaneya Doz, Roman-Kurdî
117 rûpel, Stenbol

**Salihê Kevirbirî**




**Stenbol -** Doz yek ji weşanxaneyên Kurd e ku bi salan e li bajarê Stenbolê bi keftûlefteke giran hewla weşangeriya kurdî dide. Heta niha di serî de kurdî, hejmareke mezin kitêb li pirtûkxaneya kurdî zêde kiriye. Weşanxaneya navborî, bi taybetî di sala ku me li dûv xwe hişt de, mohra xwe li bin gelek berhemên hêja da. 'Dawiya bê dawî' ya Siûd Kîkî yek ji wan berheman bû ku min bi kêfxweşî ew xwend.


Nivîskar Siûd Kîkî di vê berhemê de xewn-xeyal, serpêhatî, êş, libendemayîn, xizanî û evîna xwe ya li bajarê Stenbolê darijtiye ser kaxezê. Bêyî mubalexa dikarim bibêjim ku dema min ev behrem dixwend, min gelek caran xwe di nava vegotinan de didît, çawa ku yek ji qehremanên serpêhatiyên nivîskar ez im.

Pirtûka navborî ji du beşên bingehîn pêk tê. Beşa yekem bi navê 'demên bihûrî' ye û ji pênc beşan pêk tê. Di her beşekê de serpêhatî û bûyer bi zimanekî herikbar ango şahîk têne vegotin. Beşa duyem a bingehîn bi navê 'demên dibûhirî yan jî dawiya bê dawî' ye ku navê xwe li pirtûkê jî daye. Wekî min di destpêkê de got; serpêhatî, kurteçîrok û bîrhatinên di kitêbê de li Stenbolê derbas dibin. Nivîskar gelek salên xwe li Stenbolê derbas kirine û li wê derê xebitiye, têr bûye, birçî maye, evîndar bûye, hatiye terikandin, dîn bûye, bi ser xwe de hatiye. Bûyerên di kitêbê de di navbera salên 1994-1997-an de hatine nivîsandin. Wisa diyar e ku salên jiyandin an veçêkirina van serpêhatiyan bixwe jî heman sal in. Bi gotineke din, beşên di kitêbê de, di navbera salên 1994-1997-an de hatiye nivîsandin. Aliyê balkêş ew e ku kitêb, piştî ku bêhtirî 10 salan di refên tozgirtî an berkêşkan de maye hatiye weşandin! Sala weşandina kitêbê Gulana 2007 e. 1997 li ku 2007 li ku? Sedema vê derengmayînê êdî em nizanin...

Demek dirêj bû ku min kitêbeke wisa xweş, bi kêfxweşiyeke bêhempa nexwendibû. Dixwazim kesên ku van rêzikan dixwînin, teqez kitêba Siûdê Kîkî peyda bikin û ew jî bibin hevparê vê kêfxweşiyê. Bêguman ew kes dê cêjeke xweş jê werbigirin.

Herçî zimanê nivîskar e, herikbar û xweş e, herçiqas hevok û bêjeyên ji herêma Qosera Mêrdînê di nav kitêbê de bi awayên berbiçav eşkere dibin jî, em bi kurmanciyeke akademîk re rû bir û ne. Ji ber ku nivîskar bixwe ji aliyê Beriyê ye û ji Eşîra Kîkan e, normal e ku vegotinên vê dorhêlê li nivîsara xwe bar bike. Ev yek bi ya min dewlemendî ye. Ligel ku Siûd Kîkî, yek ji wan kesan e ku zimanê kurmancî baş bikar tîne jî; bi bikaranîna devoka xwe hostahiya xwe jî ji me re eyan kiriye.

# Yaşar Kemal bû doktorê nivîsê!



**Stenbol (Rûdaw) -** Nivîskarê navdar Yaşar Kemal dema ku xelata fexrî ya doktorayê ji Zanîngeha Bogaziçi wergirt, axaftinek kir û got ku, "Serê romûnnûsan di belayê de ye! Ji ber ku roman li dijî zilm û zordarî, derew û neheqiyan mirovî hişyar dike. Roman mirovatiyê nîşanî insanan dike."

Yaşar Kemalê ku bi eslê xwe Kurd e û romanên xwe bi tirkî dinivîsîne, wiha berdewamî axaftina xwe kir: "Min her dem ji hêza gotinê bawer kir. Roman şaxê hunera devkî ya herî girîng e. Xwendevan dema ku romanekê dixwîne, wê ji serî heta binî ji nû ve diafirîne."

Romannûsê navdar Yaşar Kemal (86) heta niha bi dehan xelat wergirtine. Romanên wî bo 39 zimanan hatine wergerandin û heta niha gelek caran bûye berendamê xelata wêjeyî ya Nobelê.

www.arsivakurdi.org

# “Ger Fransayê rola xwe bilîsta, Öcalan ne dihat girtin”

**Sirûşt Aryen**

**Paris (Rûdaw)** – Çalakvana mafê mirov, dosta Kurd, Seroka Weqfa Azadiya Fransa û jina Serokkomarê Fransa, Fransuwa Mitterandê koçkirî, Danielle Mitterrand dema di derbarê têkiliya xwe û Kurdan de diaxife, wek ku bahsa zarokên xwe bike, bi hêstiyarî diaxife. Kurd di jiyana Mitterand de demekî cîhê nawendî girtine, ew bi salên dirêj bi Kurdan re rabuye û rûniştiye, bi derdên wan re xemgîn, bi çoşa wan re bengîn buye. Bi gotina Kurdan ‘Madam Mitterand’ ji ber vê yekê dibêje Kurd wê wek ‘dayîk’ dibînin û ew jî wan wek zarokên xwe. Mitterand pirsên Rûdawê bersivand.



***Rûdaw: Birêz Danielle Mitterand Kurd bi sempatiyeke mezin li we dinêre. Di nav Kurdan de navdarên cîhana polîtîk yên Ewrûpayê nayîn zanîn û hûn ne wezîrin jî Kurdên her çar parçeyan jî we nas dike û ji we hez dike. Bawerim hûn jî ji wan pir hez dikin. Gelo ev nêzikahiya we û Kurdan ji ku destpêkir?***

Mitterand: Ez di jiyana xwe ya kar de li pirsgirêkên ku rû bi rû dimînim, bi jidilî guhdar dikim û bi wan re eleqedar dibim. Min giliyên Mehdî Zana yê Şaredarê Amedê di salên 1984 û 85an de bihîstin. Li Tirkiyeyê îşkence lê kiribûn û di girtîgehê de mabû. Sedema van tiştan jî tenê axaftina bi zimanê zikmakî bû.

Min jî wek gelek Ewrûpiyan wê demê Kurd nas nedikirin. Min Kurd nas dikirin lê dîroka wan nedizanî. Min li ser sedema zilma ku li her welatî li Kurdan tê kirin lêkolîn kirin. Min xwest fêm bikim. Lê tenê min xwe karî bigihînim agahdariyên dîrokî. Min bi Kurdên li Ewrûpayê re hevaltî kir. Di saziya CNRS’ê de lêkolînerekî derheqê Kurdan de ez agahdar kirim. Ez heta Medan birim. Yanî vî gelê Rojhilata Navîn bi min re eleqeyeke mezin çêkir. Min fêm nedikir digel ku Kurd welatiyên welatê xwe ne çima heqaret û zilmê dibînin.

***Rûdaw: Lêkolînên we çi gotin ji we re di encam de?***

Mitterand: Lêkolînên min, giliyên ku min dibihîstin teyîd kir. Çimkî nedixwestin gelê Kurd bibîhizin û kesî ew nedibîhistin. Di her carê de di bin tesîra welatên xwe de diman. Min xwest ez bi doza Mehdî Zana re eleqedar bibim û min ji saziya xwe parêzerek ji bo wî şand. A rast jê re cezayê mirinê dixwestin. Lê ji ber ku observatorên biyanî hebûn 18-20 sal cezayê girtîgehê dane wî. Li gorî me ew ceza jî nedihat qebûlkirin. Di wê demê de ji bo Mehdî Zana cezayê mirinê dihate xwestin û me wek saziya “France Libertê” biryar girt ku em mudaxaleyê vî cezayî bikin.

Piştî wê bûyerê min derheqê Kurdan de derdora xwe agahdar kir. Min wê demê rewşa Kurdên li Îraqê û jenosîda Helepçeyê bihîst. Min ji bo dîtina vê rewşê berê xwe da Îraqê. Ez li ser navê midûrê saziya xwe çûm wê derê. Min xwest ez rewşê bi çavên xwe bibînim û tiştên ku min dîtin ez matmayî hiştim. Tiştên ku min li wargehên li wê derê bihîstin, tiştên hovane bûn.

***Rûdaw: Hingê helwesta Fransa çibû li hember çewisandin û qetlîma dijî Kurdan?***

Mitterand: Dema ku ez vegeriyam Fransayê, min tiştên dîtibû yek bi yek ji hevsera xwe Francois Mitterand re got. Wê demê polîtîkaya Fransayê bêyî ku derheqê van meseleyan de tiştek bizanibe dimeşiya. Saddam Huseyîn zêdetir wek mirovek demokrat dihate naskirin. Yanî tiştên ku ji hevsera min re dihate gotin û yên ku min jê re gotin ji hev pir cuda bûn. Ew dem gotin ez hatime manupulekirin. Min nedizanî kî manupule dike. Lê min tişta ku li wir didît dizanî û tu caran min dev ji vê yekê berneda. Piştî wê demê êdî min derheqê Kurdan de dest bi axaftinê kir.

***Rûdaw: Baş e Birêz François Mitterrand derheqê mijarê de çi difikirî?***

Mitterand: Ew matmayî mabû. Çimkî tiştên ku jê re hatibûn gotin gelek cuda bûn. Min wê demê xwest penaberên di wargehên Îraqê de bînim vê derê. Bi awayekî Fransayê deriyên xwe ji wan re vekir û ev dihate vê wateyê: “Em trajediya ku tê jiyandin dipejirînin.” Bi ya min hezkirina Kurdan a li hemberî min ji wê demê dest pê kir. Îro bi navê ‘Dayê’ gazî min dikin. Çimkî di demeke ku wan qêrîn dikir û tu kesî dengê wan nedibîhist de, min ew diparastin.



***Rûdaw: Rast e, Kurd di vî warî de gelek hesas in. Digel ku di dilê polîtîkaya cîhanê de ne jî hînbûyiyê piştgiriya kesî nîn in. Yanî dibînin ku tu kes ji bo wan ji cihê xwe nalebite.***

Mitterand: Li gorî demên berê ji bo Kurdan pêşveçûnên gelek girîng pêk hatin. Ji bo wan hêsan nebû, lê wek mînak li Îraqê ji bo wan tiştên girîng çêbûn. Divê mirov vê yekê jî bibîne; Kurd bi awayek baş nêzî hev nabin û bi hişmendiya qabîleyê tevdigerin. Ji ber ku hişmendiya qabîleyê ye, di nava xwe de dikevin nava nakokiyan. Ji bo ku Talabanî û Barzanî destê hev bigrin, bi salan min hewl da. Ji ber van pevçûnên wan, bi salan min dîtina herduyan jî red kir.

***Rûdaw: Baş e we vê biryarê çawa nirxandin?***

Mitterand: Herduyan jî ji min re digotin ‘Dayê’ û her wisa dom kir. Lê bersiva min a ji bo wan ev bû: “Divê zarokên min bi hev re biaxivin û li hev bên. Ez zarokên xwe yên ku bi hev re naaxivin weke zarokê xwe qebûl nakim.” Rojekî herdû ji bo dîtina min hatin vê derê. Piştre jî pêşveçûnên demokratîk pêk hatin û min vekirina Parlamentoya Kurdistanê pêk anî.

***Rûdaw: Baş e, dema mirov paşeroja Tirkiyeyê dide ber çavên xwe, heta demên berê jî zimanê kurdî qedexe bû.***

Mitterand: Dîrok nîşan dide; ger hûn bersîv bidin, aştî tu carî pêk nayê. Ez bi PKK’iyan re axivîm, min got ‘dev ji çekê berdin em piştre biaxivin.’ Jixwe dema Öcalan hate girtin, şerê çekdarî sekinî. Digel bêdengbûna çekan jî Tirkiyeyê dev ji şer berneda. Lê dîsa jî divê mirov bibêjen ku şaşî hatine kirin. Fransa wê demê rola ku dikete ser milê wî bi cih neanî. Ger Fransayê rola xwe bi cih anîbûya, îro dê Abdullah Öcalan di girtîgehê de nebûya.




***Rûdaw: Li gorî we xeletiyên çawa dikin? Ji bo ku nêrîna we rast bê fahmkirin, hûn dikarin mînakek bidin?***

Mitterand: Bilindkirina dengê hêzên çekdarî xeletî ye. Ev yek tenê dibe sedema silbûna Tirkiyeyê û ev jî tu caran stratejiyeke baş nîn e. Lê ez vê yekê jî dibînim, Kurd miletek cesûr û jîr e. Min Kurdistana Îraqê di sala 1992an de dît. Wê demê yek xaniyek ku nehilweşiyabû tunebû. Rê berbat bûn û li her derê riyên kevir hebûn. Dema me dest bi çêkirina dibistanan kir, me ji erdê kevir radikirin û paqij dikir. Hemû deşt û daristan ziwa bibûn. Ez 10 sal piştre vegeriyam û tiştên ku min dît ez matmayî hiştim. Her der hatibû çêkirin, deşt ji nû ve şîn bibûn. Lê di navbera wan de yekitî tuneye û hêj hêzên li derve li wê derê desthilatdarin.

***Rûdaw: Digel her tiştî îro li holê tabloyek heye; Celal Talabanî û Mesûd Barzanî tên ba hev û li gorî 10 sal berê di navbera wan de girêdayînek heye...***


Mitterand: Helbet wisa ye û ev yek serkeftineke mezin e. Yek ji wan Serokomarê Îraqê û yê din jî Serokê Herêma Kurdistanê ye. Ji vê rewşê re rojek yek rabû û wiha got: “Hûn kêfxweşin, her dû zarokên we jî bûn serok?” Min ev bersiv da: “Min ji bo zarokên xwe ev tişt xeyal nekiribû, lê wisa çêbû.”

***Rûdaw: Me pirsgirêka Kurdistana Îraqê, Tirkiyeyê û pirsgirêka Kurd nîqaş kir, li gorî we ev pirsgirêk çawa dikare çareser bibe”***

Mitterand: Her gelê ku tê xwestin bê parvekirin, cudakirin, dixwaze xeyalên xwe yên serxwebûnê pêk bîne. Ez dema 18 salî bûm, min di nava berxwedana Fransayê de cihê xwe girt. Wê demê em bi birayên xwe yên Ewrûpî re di nava şerek de bûn. Dema em li ser Ewrûpayê diaxivîn û me xeyal dikir, me ‘Gelên Ewrûpayê’ xeyal dikir. Ji me tu kesî xeyala Ewrûpayeke ku hêza wê ya aboriyê zêde ye nedikir. Fikrên bi vî rengî bi demê re pêk tên. Heman rewş dê demek ji bo Kurdan jî pêk bê. Heman tişt ji bo Afrîkayê jî derbasdar e. Dema ku nexşeyên bi cetvelê hatine xêzkirin ji holê rabin, dê parzemîna li wê derê jî bigihije aramiyê.

***Rûdaw: Ez dixwazim pirseke dawî bikim. Rastiyek heye, gelê Kurd li çar parçeyan belav bûne. Zû an jî dereng divê ji vê pirsgirêkê re çareseriyek bê dîtin. Nêrîna we ya derbarê vê yekê de çi ye?***

Mitterand: Di saziya me de prensîbek heye; heta ku Îraqî ji min piştgirî nexwazin an jî heta ku nexwazin em tevlî projeyek wan bibin, ez ê êdî ji cihê xwe neleqim. Ez ê tenê ji dûrî ve temaşe bikim. Îro Îraqî xwe bi xwe bi rê ve dibin û ez naxwazim tevlî karê wan bibim û nêrîna xwe li ser wan ferz bikim. Ger rojek Kurd ji min alîkarî bixwazin, yanî bawer bikin ku wê dengê min ji bo wan bibe alîkar, ez ê li ba wan rûnêm. Lê êdî top di sehaya wan de ye. Bi vê yekê bi pirsa we, wan jî peyama xwe wergirt.



***Rûdaw: Hûn derheqê endamtiya Tirkiye’yê ya Yekitiya Ewrûpayê de çi difikirin?***

Mitterand: Hûn dizanin, min li vê odeya ku niha em tê de ne, dayikên Kurd û tirk kirin mêvan. Van dayikan ji min re wiha gotin: “Em ji vî şerî fêm nakin.” Hûn rewşa Tirkiyeyê dizanin. Ji aliyê leşkeran ve tê birêvebirin û xwediyê hemû hêzan e. Demokrasî tê wateya hilbijartina gel. Yanî hêza gel û rêveberiya gel. Ne rêveberiya leşkeran. Hin Kurd di vê mijarê de wiha dibêjin: “Ger Tirkiye bikeve Yekitiya Ewrûpayê, em ê di navendeke demokratîk de cih bigrin û wê ji bo ku em xwe bidin qebûlkirin, alîkarî bikin.” Madem ku ew bawer dikin, hêvîdar im wisa bibe. Hin kes jî wiha dibêjin: “Li Tirkiyeyê mafên mirovan tuneye û bersiva tu krîterên demokratîk nade. Her wiha ji bilî parçeyek biçûk, aîdê parzemîna Ewrûpayê nîn e û teqes cihê wê di nava Yekitiya Ewrûpayê de tune ye.”

***Rûdaw: Niha ez dixwazim bi we re hinek behsa sosyalîzma Ewrûpayê bikim. Tê dîtin ku li gelek welatên Ewrûpayê sosyalîzm paşve diçe. Ger ez ji pirtûka we mînakek bidim; çepgiriya di dema we de îdeolojîk e û ev yek bi awayekî zelal tê îfadekirin. Lê îro di şûna îdeolojiyê de zêdetir li ser berjewendiyan disekine. Li gorî we sedema vê yekê çi ye?***

Mitterand: Hûn dizanin, ev tercîha serdemek e û tercîha civaka îro ye. Di vê demê de mirov tercîha civakê nake. Li Fransayê çepgirî hêj heye. Ew di partiyên sosyalîst de nîn in lê hene...

***Rûdaw: Ev kes kî ne?***

Mitterand: Ew kesên wek min û te ne. Me û wan mirovan em li hev pir geriyan û nîhayet me di ‘Forumên Dinyayê’ de hev dît. Mirovên sibê yên dinyayê li wir pêk tên û ew mirovên ku beşdarê wê derê dibin, ji her aliyên dinyayê tên. Di wê forumê de ne tenê ji Ewrûpayê, ji çar aliyên dinyayê mirov tên. Ez îro vê yekê ferq dikim; me dema bi salan berê fikrên xwe digotin, mirovan bi awayek ecêbmayî li me dinihêrtin. Îro yên din guherîne û ev yek îşaretên pêşketinê ne.

***Rûdaw: Dema min pirtûka we xwend, min hewl da ku xwe bixim şûna we, xwîner gelek caran wisa dikin.***

Mitterand: Ger we bala xwe dabê, ez tim xîtabê xwîneran dikim.

***Rûdaw: Belê, dibe ku ji ber vê yekê ez tim xwe dixim şûna we. Baş e, gelo vegotina jiyana we ya taybet hinek zor nebû? Çimkî di vê pirtûkê de li ser jiyana we ya taybet tiştên gelek taybet hene.***




Mitterand: Min ev ferq kir; derheqê tiştên di jiyana min de tim yên din baryar dan û min tim xwe li gorî van bûyeran adapte kir. Ez niha li dijî vê yekê me. Bo nimûne, min ji bo zarokên xwe jî heman xeletiyê kir. Min ji wan re got “Di dibistanê de bibin yekemîn û baş bixebitin.” Wek formatê dîsketek... Şikir yek ji wan jî nexwend û neketin wê formatê. Di dema min de gelek hevalên min xeletiyên wisa kirin. Lê her kesî tenê tiştek dît; çi dibe bila bibe ‘serkeftin.’ Ji zarokan re ev tê gotin: “Hadê kurê min ji bo dewlemend bibî bi ser bikeve!”

Ev yek nêrîna emperyalîst a Amerîkayê ye. Sosyalîstên me ji bo ku dewlemend bibin û bi ser bikevin xwe kor kirin. Lê di rastiya vê îdeolojiyê de ev yek tuneye. Nabe jî. Îro rêveberên me tenê xwe davêjin pişt perdeya ku dibiriqe. Sosyalîstên niha jî heman tiştî dikin. Tim li pey zêdetir û zêdetirîn in. Ew ê çi bikin ji zêdeyiyan? Lê tişta ku em diparêzin ne ev in. Yanî pere û serkeftin nebûn. Di nêrîna me de mirov tişta herî girîng e. Arîsto wiha dibêje: “Helbet tişta em lê digerin ne dewlemendî ye ew tenê navgîna gihiştina tişteke din e.”

***Rûdaw: Li gorî we di îdeolojiya sosyalîstî de paşveçûn heye?***

Mitterand: Na, îdeolojiya sosyalîst yek e û hêj heye. Yên diguherin mirov in, mirov negotina îdeolojiyê tercîhtir dikin. Lê ya rast milîtanê sosyalîst bingehê ava dike, lê milîtanê anonîm tercîha civakî dike û îdeolojiyê temsîl dike. Pirsgirêk di rêveberiyê de ye, rêveberê wê yê rast tuneye.

***Rûdaw: Ev axaftinên we milîtanê bi navê Olivier Besancenotê ku di polîtîkaya Fransayê de cih digre tîne hişê mirov. Digel ku zanîngeh qedandibû jî xebata wek postager (postaci) tercîh kir. Yanî dikaribû tercîheke pir cuda bike. Ger ne xelet bim, dahatina wî ya mahena hezar ewro ye. Ji sosyalîzmê wêdetir, di Yekitiya Komunîstên Şoreşger (LCR) de cih digre.***

Mitterand: Belê kesekî wisa ye ku bi mantiqa xwe tevdigere. Îdeolojiyê heta şêneyên xwe nexş kiriye. Hêj gelek ciwan e, hêvîdarim wê bi heman awayî bimîne. Hûn dizanin, ji bo ku mirov bibe rêveberek baş divê mirov dîroknasek baş be. François wisa bû. Beriya ku bûyerek binirxîne, dîrokê di konteksta xwe de bicîh dikir. Oliver Bencocenot kesek pir baş e, bi xwe re di nava aştiyê de ye, bi îdeolojiya xwe re di nava aştiyê de û nêrîna wî gelek xweşik e. Ez wî ciwanî pir teqdîr dikim û bi eleqeyeke mezin lê guhdar dikim.

www.arsivakurd.org

# Obama bi 'şûr' erişê Afxanistanê kir



**Serwîsa Cîhanê** - Vekişîna hêzên leşkerî yên Amerîkî ji Îraqê qediya, tenê rojekî piştî wê Artêşa Amerîkî li parêzgeha Helmanê dest bi operasyona herî mezin li Afxanistanê kir. Bi helîkoptêr û alavên leşkerî yên giran hêzên Amerîkî li başûrê Afxanistanê derketin şerê hêzên Taliban. Operasyona bi navê "Derbeya Şûr" di sersibeya roja pêncşemê li beşekî ji parêzgeha Helmandê destpêkir. Bi alîkariya hêzên hewayî yên NATO'yê û tevlîbûna leşker û polîsên Afxanî artêşa Amerîkî dixwazê Talîbanan ji parêzgeha başûr, ji Helmandê derkin. Weke ku tê îdiakirin hêzên Amerîkî rastî berxwedanek mezin hatine. Berdevkê Talîbanan ji bo CNN'ê da xwiyakirin ku hêzên wan 33 leşkerên Amerîkî kuştine û çend balafir jî anîne xwarê. Artêşa Amerîkî û NATO'yê ew agahiyên berdevkê Talibanê derewandin, lê tu daxuyanî ji di derbarê operasyonê de nedan.

Li Afxanistanê ev êrişa Amerîkiyan ya herî mezin e ji dema destbikarkirina Barack Obama. Bi vê yekê Serokê Dewletên Yekgirtî yên Amerîkayê (DYA) di navbera dû rojên borî dû sozên xwe yên ku di dema propagandaya hilbijartinan de dabû, pêk anî: Beriya çend rojan bi fermî artêşa Amerîkî dawî li paşvekişandina hêzên xwe ji Îraqê anî û piştî wê bi çend rojan hêzên wan dest bi operasyonek mezin li dijî hêzên Taliban kirin.

**Li Helmandê Îslamist gelekî bihêzin, xwedî bi hezaran şervan û alavên leşkerî yên giran in**

Di dema propagandaya hilbijartinan de Obama soz dabû ku berpirsiyariya asayîşa Îraqê li hikûmeta wan vegerînê û barê leşkerên Amerîkî hêsan bikê. Ew dibêjê ku divê li Afxanistanê bi dijwartir li dijî teroristan û serhildêran bê şerkirin. Piştî ku Obama dest bi karê xwe kir hêzên Amerîkî ji Îraqê vekişand, da kû karibê hêzên xwe li Afxanistanê bihêztir bikê. Obama li Afxanistanê sê armanc danîne pêş hêzên xwe yên leşkerî: Perwerdekirina hêzên ewlekariyê yen Afxanî, piştgiriya hikûmeta lawaz ya li Kabîlê û parastina gelê sivîl. Taktîka nû ya hêzên Amerîkî ku sala dawî ji desthilatiya serokê berê yê DYA'yê George W. Bush li Îraqê derket pêş, ji bo Afxanistanê jî wek mînak li ber çavan tê girtin.

Destpêkirina operasyona Amerîkiyan ya dawî li parêzgeha Helmanê, ku yek ji parêzgehên herî ne aram tê hesibandin, sînyalekî DYA'yê ji bo Taliban e. Li Helmandê Îslamist gelekî bihêzin, xwedî bi hezaran şervan û alavên leşkerî yên giran in. Hêzên leşkerî yên Brîtanyayê di van hefteyên borî de li herêmê bi serê xwe dest bi operasyonekê kiribûn. Hêzên Brîtanî û Amerîkî li van deveran hertin qurbaniyên mezin didin. Herî dawî di çarşema borî de di encama teqîna mîneke li kêleka rê du leşkerên Brîtanî jiyana xwe ji dest dabûn. Talîbanan dan xwiya kirin, ku ew dixwazin hilbijartinên serokatiyê li Afxanistanê di meha Gelawêj de têk bibin. NATO û Wezareta Derve ya Amerîkayê wan hilbijartinan wek rojek giring dinirxînin. Eger hêzên Taliban karibin kêsên çavdêriya hilbijartinan dikin birevinin û nehêlin gel beşdarî hilbijartinan bibê, wê demê bawerîya gelê Afxanî bi Demokratiyê bêtir têk diçê.

**Artêşa Amerîkayê di bin fermandariya serfermandarê nû yê Rojhilata Navîn General Petraeus taktîka xwe li Afxanistanê guhert**

Operasyona bi navê "Derbeya Şûr" îşareta wê yekê ye ji ku Amerîkî dixwazin li herderê Afxanistanê rewşa ewlekariyê baştir bikin.

Li gor rojnameya Amerîkî New York Times'ê "Derbeya Şûr" di dişakontrolkirina Afxanistanê gava yekemîn e. Niha li Afxanistanê hejmara leşkerên Amerîkî 60.000 e û tê çaverêkirin ku heta dawiya salê 8000ên din jî li wan zêde bibin. Ji bo kû karibin li Afxanistanê çalaktir bin, budçeya parastinê ji aliyê Kongresa Amerîkî bi 50 milyar dolarên Amerîkî hat zêdekirin.

Artêşa Amerîkayê di bin fermandariya serfermandarê nû yê Rojhilata Navîn General Petraeus taktîka xwe li Afxanistanê guhert:

**Berdevkekî Talîbanan daxwiyand ku ewe berxwedanekî mezin nîşan bidin**

Bombebarankirina bi firoke û helîkoptêran ji jor û operasyonên hêzên taybet li jêr wek awayê têkoşînê têr nayê dîtin. Hêzên Amerîkî vêca bi hejmarek mezin diçin ser Talîbanan û hewldidin wan ji herêmê derxînin. Bi 4000 leşkerên Amerîkî yên taybet û 650 leşkerên Afxanî taktîka nû ya li dijî terorê tê bicihkirin. Bi vê operasyonê hewl tê dayîn ku aramiya herêmên başûrê welêt bê başkirin û dixwazin ku hêzên Amerîkî li wan herêmên ku Talîbanan jê derxinin bicih bibin. Li wan herêman daxwaz ewe ku alîkariya gel li dijî hêzên fanatîk bi dest bixin.

Berdevkekî Talîbanan daxwiyand ku ewe berxwedanekî mezin nîşan bidin û ewê ji herêmê denekevin û got ku Amerîkî wê jî vî şerî serkeftî dernekevin. Di vê navberê de Pakistan'ê li ser sînorê navbera xwe û parêzgeha Helmandê hêzên xwe bicih kirine, da kû şervanên Taliban yên ku bixwazin birevin desteser bike. Rêxistina Taliban di dema dagirkirina Afxanistanê ji aliyê Sovyetê ve di dibistanên Îslamî yên Pakistanî derketibûn pêş. Li Pakistanê ji artêş bi operasyonekê dest bi şerê Talîbanan kiriye.

# Mizgefta Kölnê dibe mijara nîqaşan



**Köln** - Li Almanyayê avakirina mizgeftên mezin dibin sedemên gengeşiyan. Herwiha Musilman ji vê pêşveçûnê di çarçova zagonan de wekî pêkanîna "azadiya olan" dibînin.

Li gor lêkolînên ku li Almanyayê tên kirin, tê texmînkirin ku hijmara Musilman ji çar milyonan zêdetir e û di Almanên ku derbasê ser dînê Îslamê dibin zêde bûne. Musilman perçeyeke giring ji civaka Almanyayê ne û êdî di warê maf û azadiya olî de daxwazên xwe bi dengekî bilind bilêv dikin.

Yek ji daxwazên wan ev e ku Musilman ji pişt kolanan derkevin, mizgeftên nû, modern û mezintir avabikin. Lê ev daxwaz dikare li Almanyayê bibe sedemê gelek reaksiyonan. Mirov dikare di vê warê de gengeşiyên mizgefta mezin li Kölnê, ku tê avakirin, mînak bide. Gelek siyasetmedarên Yekîtiya Partiya Xiristiyan (CSU) û rastgirên radîkal li dijî çêkirina mizgefta Kölnê helwestên xwe dabûn raxistin û hawldabûn ku pêkanîna projeya mizgeftê asteng bikin.

**"Nasnameya Musilmanan ya olî hat îhmalkirin"**

Pisporê lêgerîna ola Îslamê yê dêra Protestan Prof. Christine Schirmmacher niqaşên li Almanyayê bi îhmalkirina nasnameya olî ya Musilmanan ve girêdide. Ew dibêje, bi salan e mijara bi hevre jiyana Musilman û ne Musilmanan tê îhmalkirin: "Ji ber ku hatiye hesabkirin ku wê rojekî mirovên biyanî û xebatkarên ku di statuya mêvandariyê de li vir dijîn, vegerin biçin welatê xwe. Civaka Alman jî wisa difikirî. Di vê civakê de insan hevûdû nasnakin, nêzîkî hevûdû nabin. Di rastiyê de mirovên herdû civakan pêrgî hevûdû nebûnê. Lê îro civak gûherîne. Êdî tê zanîn ku li Ewrûpa û Almanya Musilman jî dijîn. Di gel vê di gelek cihan de mirovên herdû hêlan hîn jî hevûdû nasnakin."

**Xema Îslama siyasî**

Di gengeşiyên li Almanyayê ku li ser mizgeftan rûdide, pirsgirêk pirani li ser şêweya mizgeftê, bilindiya mînareyê, cihê avakirina mizgeftê, fînansmana avahiyê ne. Şêweyeke din yê gengeşiyan jî ev e ku avakirina mizgeftan encama siyasîbûna Îslamê ye. Ev yek jî di civaka Alman de dibe sedemê endişeyan. Prof. Schirmmacher dibêje ku şêweya mizgeftan pirsgirêk nîne, ya giring tevgerên ku di çarçove û hundirê mizgeftê de biqewimin e: "Pirsa giring ev e: Di van mizgeftan de wê çi bê hînkirin? Em dizanin tevgerên ku di nav mizgeftan de diqewimin, astengî li ber jiyanê hevpar datîne. Li wir têgihiştinekê Îslamê yê pêkanîna jiyana bi hevre û nenaskirina nasnameya civaka Rojavayê pêk tê. Belê ev li herderê ne wisa ye. Lê li hinek deveran ev wek problem rûdide."

Berpirsiyarê diyaloga navbera çandan ya weqfa Herbert Quandt, Roland Löffler jî li ser heman xem û tirsan destnîşandike ku sedemên gotinên dijwar li ser gengeşiyên di warê mizgeftan piştî êrişa 11'ê îlonê mezin bûne. Herwiha Löffler dibêje ku mirov bi xem in, ji ber ku Îslama siyasî heye, wekî dîn ditirsin ku wê Almanya jî biguhere, ev jî dibe sedemê niqaşên dijwartir.

**Mînakên erênî**

Ji alî din ve hêjayê gotinê ye ku li Almanyayê mînakên erênî jî hene. Wek mînak sala borî li bajarê Duisburgê mizgefteke mezin hat avakirin. Wekî din mizgefta li bajarê Penzbergê ji balê dikşîne ser mînare û mîmariya xwe. Mîmarê mizgefta Penzbergê Allen Jasareviç ji Bosna Hersekê ye. Ew difikire ku wê ev mînare dawî li pêşhukmiyan bîne: "Ji bo min wek Musilman, hebûna mizgeftan li Almanyayê giring e. Şêwe û şeklê wê û ka çawa tê xuyakirin, bo min qet giring nîne. Lê ez wek kesekî ku estetîkê difikire, nûjeniya mîmariyê bala min dikşîne. Gelek Alman jî wek min difikirin. Wek mînak, gelek kes li Penzbergê diçin seredana mizgeftê û dipirsin, 'gelo ev mizgeft e?' Ew dizanin ku ev mizgeftek e, lê di mejiyên wan de jî gelek pirs peydadibin."

## Somaliya têkdiçe



**Serwîsa Cîhanê** - Di encama şerê çekdarî ya navbera hêzên hikûmeta Somaliyayê û hêzên Îslamî heta niha ji 120 hezarî zêdetir însan di şer de hatine kuştin. Di çend hefteyên borî de li paytexta Somaliya li Mogadişûyê û derdorên wê bi sedan mirov hatine kuştin û bi hezaran jî brîndarbûne. Di encama şerê dawîn de bi dehan hezar kes jî koçber bûne. Ev karesata niha encama wan gavên siyasî yên demên borî û nekaranîna derfetên ku ketin dest tên hesibandin. Zêdebûna şiddetê li başûrê Somalyayê dibê tehdîd li ser wan peşkeftinên dawî, ku di Berfenbara 2008an de hatibûn bidestxistin. Li gor nûnerên rêxistina Amerîkî International Crisis Group, Daniela Kroslak û Andrew Stroehlein, eger di demekî nêz de tedbîrneyên stendin, gelê Somaliyayê wê rastî karesateke xirabtir werê û îhtimala şerekî mezintir yê navxweyî peyda dibê. Encama vê yekê jî wê koçberiyekî mezin û bilindbûna şiddetê bê.

Pêvajoya aştiyê ku bi "pevajoya Djibûtî" tê naskirin û ji aliyê Netewên Yekgirtî tê piştgirkirin di sala borî de bi peymanekî aştiyê ya navbera hikûmeta navendî û fraksyona Îslamî "Hevgirtina Ji Nû ve Jiyandina Somaliyayê (ARS)" ku bi serokatiya Şêx Şarîf Ahmed e, bi encam hatibû.



# YE'yê nûnerên xwe ji Hondûrasê kişand

**Serwîsa Cîhanê** - Piştî ku desthilata sivîl li Hondûrasê bi darbeyekî leşkerî hat rûxandin, YE'yê zextên xwe yên diplomoatîk li ser vî welatî zêdetir kirin. Bi daxuyaniyekê Wezîrê Derve yê Spanyayê Miguel Angel Moratinos da zanîn, ku welatên YE'yê biryar dane ku nûnerên xwe ji vî welatî paşve bikşînin. Li gor Moratinos bi vê biryarê YE dixwazê zextê li ser hezên darbekar bikê, ku ew disa li ser "ji nûve avakirina desthilata sivîl bifikirin."

Bi vê yekê ji niha û heta demek nediyar welatên Almanya, Îtalya, Fransa, Spanya û Komisyona Yekîtiya Ewrûpayê nûnerên xwe ji Hondûrase paşve dikşînin.

Ji bo ku welatên YE'yê nûnerên xwe disa bişînin Hondûrasê, yek ji şertên wan ew e ku destûr bê dayîn, da ku serokê vî welatî yê hilbijartî Manuel Zelaya disa vegerê ser karê xwe.

Welatên YE'yê roja çarşemê biryar dabûn ku desthilatdarên nû weke muxetab ji bo danûstendinan negrin. Lê serokê demkî Roberto Micheletti vegera serkar yê Serokê welat Manuel Zelaya redkir û got ku, "eger ew vegerê, wê werê girtin."

Hêzên leşkerî yên Hondûrasê yekşema borî darbeyekî leşkerî pêkanîbûn û Zelaya biribûn welatê Costa Ricayê û wek sedema vê gava xwe jî niyeta Manuel Zelaya ku dixwest di hilbijartinên sermawezê de bi awayekî dijqanûnî careke din bibê serok, nîşan da.

Di vê navberê de Kongreya Hondûrasê biryara astengkirina çend mafên destûrî yên wek "azadiya çalakiyan" û "azadiya livînê" girt.

# ”Xwe wek li welatê xwe bibînin”

**Zeki Özmen**



*Wêne: Landkreis Marburg-Biedenkopf*

**Marburg (Rûdaw) –** “Biedenkopf Kreis” herêmekî li Almanya, li parêzgeha Hessenê ye. Şêniya herêmê zêdeyî 252 hezaran e. Derdora 50 hezaran, ango ji sedî 20ên wan biyanî ne. Birêveberiya vê herêmê taybetiyekî girîng didê karê întegrasyona biyaniyan.

Bi taybetî sazî, rêxistin û dezgehên çapemeniyê yên Kurdan pêvajo û rûdanên di derbarê guftûgoyên întegrasyonê yên li Almanyayê kêm caran ji xwe re dikin mijar.

´Nivîsgeha Întegrasyonê ya herêma Marburg-Biedenkopf Kreis´ (Büro für Integration des Landkreises Marburg-Biedenkopf) nivîsgehekî fermî ye, ku ji bo biyaniyên vê herêmê çalakiyên li ser întegrasyonê lidardixe.

Me bi riya telefonê têkilî bi rêveberê nivîsgehê Claus Schäfer re danî û daxwaza hevdîtinekî jê kir. Lê ji ber zagonên taybet yên rêveberiya herêmê, diviyabû Schäfer beriya hemû tiştî destûra hevpeyvînê ji alîkarê qeymeqamê herêmê Dr. Karsten McGovern bixwazê.

Hem destûra hevpeyvînê hat dayin û hem jî me dikaribû digel Schäfer bi kesekî din re jî hevpeyvîn bihata çêkirin. Kesê din jî Dr. Karsten McGovernê ji Partiya Keskan (Die Grünen) bû. Partiya Keskan li parêzgeha Hessenê bi Partiya Xirîstiyanên Demokrat (CDU) re hevparê birêveberiya herêmî ne.

Hevdîtina me ya li gel Claus Schäfer û McGovern li avahiya rêveberiya herêmî li dar dikeve.

Me bi pirsa li ser hijmara biyaniyên ku li vê herêmê perwerde dibînin destpekir. McGovern bi xwe jî Almanekî esilîrlandî ye û ev yek jî ji bo me tê wê wateyê ku ew dikarê baştir rewşa biyaniyan fêm bike. Di vê navberê de McGovern dibêjê ku di salên 1960an de gelek karker ji welatên mîna Tirkiyeyê hatin û li herêmê bi cih bûn û herwiha ji bilî vê yekê jî, piştî „şerê cîhanê yê yekem“ gelek Almanên ji welatên din hatibûn qewitandin, li vê herêmê niştecih bûne.

Li se hijmara Kurdên li vê herêmê jî van agahiyan didê: “Hijmara Kurdan bi awayekî taybetî di îstatîstîkan de derbas nabe. Li vê herêmê 7 hezar mirovên ji Tirkiyeyê hene. Li ser yên ji Iraqê jî agahiyên li ser hijmara wan nîne.” Li ser vê yekê Claus Schäfer jî xwe tavêjê nava axaftinê û dibêjê ku îstatîstîk li gora hevwelatîbûna fermî tên amadekirin.

Bêguman tiştê ku Claus Schäfer dibêjê ne tenê taybetmendiyekî vê herêmê ye. Ev yek herwiha ji bo hemû Almanyayê wiha ye. Em piştî vê agahiya ku divê saziyên Kurdên Almanyayê hinekî li ser bifikirin, ji birêz McGovern dipirsin ka gelo bihevrejiyana biyanî û Almanên li herêma wan çawa ye. Bersîva wî jî wiha ye: ”Hema bêje hemû bêyî tu pirsgirêkan bi hevre dijîn, lê belê em nikarin bêjin ku hevjiyaneke wiha ye, ku zêde têkiliyên dualî hebin. Mirov dibînê ku gelek biyanî di nava komên xwe de dijîn. Ev hem ji bo Tirkan û hem jî ji bo kesên ji Sovyeta berê jî wiha ye...”

Li ser vê yekê em berê xwe didin pisporê întegrasyonê Claus Schäfer û dixwazin ji wî bibihîsin ka ji bo wî bi xwe ´întegrasyon´ tê çi wateyê. Schäfer bi bîr dixe ku întegrasyon pêvajoyekî demdirêj e û wiha pêde çû: “Ev pêvajoyekî dûalî ye û divê her du alî di vê derbarê de xwedî bandor bin. Kesên li vir niştecih dibin, divê ji hêla fikrî ve jî li vir niştecih bibin. Divê civaka Alman jî wan bi cudabûna wan ya olî, çandî û taybetmendiyên wan yên din qebûl û hembêz bike. Herwiha di hemû warê jiyanê de divê mafê wan hebe...”

Ew herwiha bibîrdixe, ku kesên bi vî awayî û yên bi awayekî din dijîn jî hene û dibêje ku gelek Alman hêjî bi çavekî wiha li biyaniyan nanêrin, ku ewê hertim li vî welatî bijîn. McGovern jî li ser vê yekê behsa hinek hewlên rûxandina wan nakokiyan dike. Ew herwiha wek pirsa bersîveke din ya li ser gelo ´kesayetiya întegrebûyî´ çiye, dibêje ku hesta subjektîf rolekî dilîze û mînakekî didê: Dema mirov ji kesekî ku li Almanyayê jidayîk bûye bipirsê, ka ew ji ku ye û ew rasterast bibêje ku ew ji welatê dê û bavê xwe hatiye, ev tê wê wateyê, ku ew ne kesekî întegrebûyî ye.

Sohbeta me li ser pirsgirêka întegrasyonê û lêkolîneki nû, ku dibêjê herî kêm Tirk li Almanyayê întegre dibin, berdewam dike. Piştî vê babetê em vedigerin ser saziyên Kurdan û xebatên wan yên întegrasyonê. Em bibîrdixin ku gelek saziyên Kurdan gazinan dikin, ku rayedarên Alman gelek caran ji bo xebatên wan yên întegrasyonê kelaman derdixin û vê yekê bi berjewendiyên Tirkiye û Almanyayê yên aborî û siyasî girêdin. McGovern jî dibêjê ku heta niha tu komelên Kurdan li ser vê yekê bi projeyên konkret serî li wan nedane û berê xwe didê Claus Schäfer û jê dixwaze ku ew erê bike ku komelên Kurdan li herêma wan tune ne.

Lê ew dîsa dibêjê ku bi awayekî giştî dema hewlên têkilîdanînê bi rêveberiya wan re çêdibin, ew pirs dikin ka ew kesên ku tiştekî ji wan dixwazin kî ne: “Lê ji bo min girîng e ka kîjan komele kîjan dîtina siyasî diparêze. Meseleya me ji hêla herêmî ve ne Tirkiye yan yekî din e. Belkî ji hêla Hikumeta Federal hinek xetên siyasî hebin, lê ez nikarim li ser vê yekê tiştekî bêjim. Herçiqas çêne bûye jî, bêguman dema saziyeke Kurd serî li me bide, emê bixwazin bizanibin ka ew kî ne û li dû fikrên radîkalin yan na.”

Li ser vê yekê em dipirsin ka krîterên radîkaliyê çine û McGovern wiha dibêje: “Krîterên vê yekê yên diyar tune. Carcaran me hevkarî bi hinek saziyên biyaniyan re kir û paşê saziyên dewletê serî li me dan û em agahdar kirin ku navê wan rêxistinên ku me alîkariya wa kir, di nav lîsteya Saziya Parastina Destûrê de derbas dibe. Ji me tê pirsîn, ka çima me hevkarî bi rêxistinekî ku navê wê di raporta Saziya Parastina Destûrê derbas dibê, kir. Hûn çi dikin û ma divê wek herêm hûn ne bêtir hay ji vê yekê hebin, ji me tê pirsîn. Bêguman ev nimûne ne di derbarê saziyên Kurdan de ye...“

McGovern giredayî vê yekê dibêjê ku ji ber vê sedemê ev xalek e ku ew divê zanibin. Paşê ew dinêrin ka heta çi radeyê ew dikarin hevkariyê bikin. Ew herwiha xaleke din jî wek mînak dide û dibêjê dema ew bizanibin ku hevkarên wan dixwazin bi navên wan propagandaya siyasî bikin, ew hevkariya xwe bi dawî tînin. McGovern dibêjê ku ev yek ne tenê ji bo rêxistinên biyanî, lê ji bo partiyên siyasî yên Alman jî wiha ye û ew destûr nadin ku bibin aletê siyasî.

Em di dawiyê de ji Claus Schäfer pirs dikin, ka banga wî ji bo Alman, Kurd û biyaniyên din çiye. Schäfer ji dil û wek ji girseyekî re biaxife: “Xwe wek li welatê xwe bibînin. Xebatên xwe di çarçova vî welatî de bikin. Ne li benda tu kesî bin, hûn bi xwe têkiliya deynin. Xebatên siyasî bikin, lê siyasetekî ji bo welatê hûn lê dijîn. Bila xebatekî li ser Kurdistanê jî hebe, temam, lê belê ne tenê bi wê sînorkirî. Herwiha bila saziyên we di nava têkiliyên bi komên xebatê yên hevkariya komelan de bin. Tiştekî din ya di dilê min de, di saziyên xwe de rê bidin ciwanan, ji ber ciwan xwedî cewherên ku nayên dîtin in.“

Dr. Karsten McGovern berî ku xatir ji me bixwazê dibêje: “Ezê kêfxweş bibim, ku Kurdên li herêma me werin cem hev, ne tenê ji bo siyasetê, lê ji bo çandê û çalakiyên din jî. Gelên din jî hene ku her dem li vir kom dibin û xelkên din vedixwînim.“

# Jahrfiroşê Hollandî 16 sal ceza girt



**Den Haag (Rûdaw)** –Dadgeha Bilind ya Hollandî Hoge Raad li jahrfiroş Frans van Anraat 16 sal û nîv cezayê zindanê birrî. Van Anraat di salên 1980an de maddeyên kîmyewî ku di çêkirina çekên komkujiyê de hatine bikaranîn firotibû Rejima İraqê. Di rûniştina roja 30/06/2009an de dadgehê daxwaza tazmînatê yê xizmên qurbaniyan jî redkir. Xizmên qurbaniyan ji bo her qurbaniyekî ji tawanbar van Anraat 360 Euro taleb dikirin.

Kurdên ku bi reya dagehê doza cirmê kiribûn brîndar an jî xizmên êrîşên kîmyewî yên ser bajarên Helebçe û Serdeştê (Rojhelatê Kurdistanê) ne. Li gor qurbaniyên keresteyên çekên komkuj yên Rejima Baas ji alî van Anraat ve hatibûn firotin û ji ber vê yekê ew ji berpirsiyarê êş û zirarên wan e.

Parlementerê Hollandî û Kevnedozgerê Giştî Fred Teeven ji biryara dadgehê ne razî ye. Ew dibêje wê jib bo parastina mafê qurbaniyan proje yasayekî pêşkêşî parlamentoyê bike.

Parêzer Liesbeth Zegveld jî ku di dadgehê de nuneratiya şanzde qurbaniyan dikir, ji biryara dadgehê dilgiran e: “Ez fahm nakim çawa li Hollanda dest li ruyê qurbaniyên şer tê dayîn û doza wan tê redkirin. Lewra li Dadgeha Bilind di warê tawanên şer de mafê qurbaniyan gelek eşkere tê parastin. Belgeyên me hene ku heşt gund bi keresteyên ku van Anraat firotiye hatine kîmyabarankirin. Ji ber vê yekê emê ji bo cirmdayîna qurbaniyan serî li dadgeha sîvîl bidin.”

**Li Bexdayê Xwe Veşartibû**

Frans van Anraat, ku niha temenê wî 66 sal e, li gor raporteke Netewên Yekgirtî (NY) di navbera salên 1984 û 1989an de nêzîkî 1117 ton keresteyên kîmyewî firotiye Hikumeta İraqê. Van Anraat heta rûxana Rejima Saddam Husên ya sala 2003an li Bexdayê dijiya. Paşê ew bi reya Sûriyê hat Ewrûpayê. Di sala 2004an de de piştî ku Dezgeha Saloxdarî ya Hollandayê (AIVD) van Anraat girt. Di dosyeya binçavkirina wî de hatiye nivîsandin ku di dema girtina wî de van Anraat baholên xwe hazir kiribû û duxwest bireve.

Piştî girtina wî ji aliyê kes û komelên Kurdên Hollanda û çend kesayetiyên Hollandî, jahrfiroş van Anraat tê berdadkirin û di 2005an de hukmê panzdeh sal zindan lê tê birrîn. Di biryara vê dadgehê de kîmyabarana Kurdistanê bi awayekî fermî wek ‘komelkujî’ jî hatibû binavkirin. Piştî wê di sala 2007an de dadgeha bilind cezayê van Anraat hinekî din jî zêdedike û 17 sal û niha jî cezayê van Anraat hatiye kêmkirin û bûye şanzdeh sal û nîv.

# Ewrûpa ji Tirkiyê destûreke nû dixwaze



**Strasbourg –** Konseya Meclîsa Parlementerên Ewrûpayê bang li Tirkiyê kir, da ku Tirkiyê destûra xwe ya 1982an biguherîne.

Bang di rûniştinên komelî ya giştî ya meclîsa parlementeran de, ku hîn jî domdikin, wek rapor di bin sernivîsa ”Rewşa Mafê Mirovan li Ewrûpayê û Kontrola Mekanîzmaya Siyasî ya Meclîsa Parlementeran“ cîh digre.

Kontrola mekanîzmaya siyasî ya meclîsa parlementeran niha ji yanzdeh welatan pêktê: Arnavutlûk, Ermenîstan, Azerbaycan, Bosna-Hersek, Gurcistan, Moldova, Monako, Montenegro, Rusya, Sirbîstan û Ukrayna. Wekî din welatên wek Tirkiye, Bulxarîstan û Makedonya piştê kontrola mekanîzmaya meclîsa parlementeran di pêvajoka diyaloxê de cihê xwe digrin.

**Kêmnetewên Xeyrîmuslim**

Di raporê de ji Tirkîyê tê xwestin ku divê ew destûra xwe ya 1982an seranser bigûherin. Herwiha tê xwestin ku ew bi hevkariya komîsyona Venedîkê, ku di wan babetan de organa referansa komîsyona Ewrûpayê ne, li gor standartên Ewrûpayê destûreke nû amadebikin.

Beşekî ji rexneyên li hemberî Enqerê jî mafên xeyrîmusluman di warê huqûq û perwerdeyê de ye, ku nayên cîh. Konseya Meclîsa Parlementerên Ewrûpayê ji Tirkiyê daxwaz dike, da ku ew di warê mafên olî yên xeyrîmusluman de, pisgirêka bikaranîna Ekumenîk ya Patrîkxaneya Ortodoksên Rûm û statuya dibistana Heybeli Ada ya Ruhban li gor standardên huqûqa Ewrûpayê were pêkanîn. Di çarçova diyaloxê de, ku dê piştê kontrola mekanîzmayê li ser were sekinandin û ji Tirkiyê tê xwestin ev in: Rakirina astengên li pêşiya mafê azadiya rêxistinan, pêkanîna biryarên dadgeha mafên mirovan, serxwebûna dadgehan û çareserkirina pirsgirêkên red a wijdanî, îmzekirina hevpeymanên Ewrûpayê li ser mafên kêmnetewan û rakirina xemên xwe yî coxrafî a ku di hevpeymana Cenevrê di sala 1951an de cîh digre. Herwiha di çarçova raporê de rewşa tendirûstiya Serokê PKK’ê Abdullah Ocalan jî cîh digre, ku dê piştê pêvajoya kontrola mekanîzmayê bînin rojevê.

**Rexneyê ji alî Tirkiyê**

Enqere li ser hinek beşên raporê ne kêyfxweş e. Grûba parlementerên Tirkan ku ji 12 kesan pêk tê, dan xuyakirin ku pirsgirêka mafên kesayetî ya Patrîkxane ya Rûm ji destûra Tirkiyê ya laîk derdikeve holê. Herwiha pêkanîn ji bo kesên ku Musilaman in jî derbasdibe û di peymana aştî ya Konferansa Lozanê de wiha hatiye lihevkirin. Ev jî tê vê wateyê ku tenê maf û pêdiviyên rûhanî ya Ortodoks ya Rûm ya li Stenbolê tê naskirin.

Enqere, li hemberê rexneya Konseya Meclîsa Parlementerên Ewrûpayê, ku guherînên di nav çarçova xala 301an de astengiyên li pêşiya mafên azadiya fikr û ramanan ji holê ranake, helwest nîşandide. Grûba Tirk dibêje ku li welatên Ewrûpayê jî gelek pêkanînên ku dişibin xala 301an ê hene û di vî warî de Tirkiye heta niha ji alî dadgeha mafê mirovan yê Ewrûpayê ve nehatiye darizandin.


## Rûdaw Şertên Abonetiyê

**Ji bo salekî:**
Almanya, Belçîka, Awûstûrya, Fransa, Hollanda: 60 Euro
Swîsre: 120 CHF
Brîtanya: 60 GBP
Swêd (Schweden): 900 SEK
Danîmarka (Danemark): 600 DKK
DYA (USA): 100 USD
Kanada : 120 CD
Tirkiye: 100 YTL

**Ji bo şeş mehan:**
Almanya, Belçîka, Awûstûrya, Fransa, Hollanda: 30 Euro
Swîsre: 60 CHF
Brîtanya: 30 GBP
Swêd: 450 SEK
Danîmarka: 300 DKK
DYA (USA): 50 USD
Kanada: 60 CD
Tirkiye: 50 YTL


**Ji bo Almanya:**
Rudaw Media GmbH
Bank: Deutsche Bank Köln
Konto Nr: 2450161
BLZ: 37070024

**Ji derveyî Almanya:**
IBAN:
DE48370700240245016100
BIC: DEUTDEDBKOE

**Navnîşan:**
Rudaw Media GmbH
Gutenbergstr. 63a
50823 Köln / Almanya
**E-maîl:**
rudawkurmanci@yahoo.com

Piştî ku bihaya abonetiyê li ser hesabê bankê hat razandin, ji kerema xwe re dekontê bankayê tevî navnîşana xwe bi riya e-maîl an jî nameyê bo Rûdawê bişînin. Piştî ku dekonta we gihîşt, wê abonetiya we destpêbike û heftane rojname wê ji were bê şandin.

# Rojnameyeke me tune ku pirtûkên me bide nasandin!



**Stenbol (Rûdaw) –** Li Beyoğlu ya Stenbolê di qata yekem a avahiyeke dîrokî de pirtûkxaneke biçûk û dewlemend...Bê deng, lê muşterîyên giran li her pirtûkekê bi baldarî temaşe dikin, li gel pirtûkên lêkolînan, hemû berhemên nivîskî yên li ser Kurdan tên xwiyakirin, ji xwe li Tirkiyê yek pirtûkxane heye ku bi kurdî û li ser mijarên pirsgirêka Kurdan pirtûkan difroşe: Ew jî Pirtûkxaneya Medya ye. Selahedîn Bulut hem nivîskar e û hem pirtûkfiroş e. Em bi Bulut re li ser serpêhatiya wî ya pirtûkfiroşiyê axifîn.

***Pirtûkxana Medya kengî hate damezrandin?***

Selahedîn Bulut: Di sala 1997an de li Stenbolê min Pirtûkxana Medya vekir. Dema min biryara vekirina pirtûkxanê da, pêdivîyeke wiha hebû. Zehmet bû li Tirkiyê bi awayekî baş pirtûkan bibînê ku yên me buyana û em bianîna ziman. Min ev kêmasî dît û bi wê fikrê û bê sermaye pirtûkxane vekir. Heta niha jî karê xwe didomînim.

***Li Stenbolê hebûna weşanxaneke ku pirtûkên kurdî difiroşe çawa hate bihîstin?***

Selahedîn Bulut: gelekî zû hate bihîstin. Ji ber ku ne li Stenbolê û ne jî li Tirkiyê ciyekî din wek yê me tune bû. Pêwistiyên min, pirsgirêka xwendevan jî bûn. Salên destpêkê wek jestek bo xwendevanan; Her Newroz min pirtûkeke kurdî bê pere dida. Pişt re min pirtûkek û elfabeyeke kurdî da. Bandora vê jî hebû dema hate bihîstin. Êdî pirtûkên min dihatin firotin, bê guman govar jî hebûn, xwendevanan jî êdî ew li gel pirtûkan didîtin û dixwendin.

***Dema we pirtûkxana xwe vekir ji hêla Kurdan ve ne serdemeke bi jan bû?***

Selahedîn Bulut: Belê, bi jan û zehmet... Bi taybetî navbera salên 1997-2000an... Heyvê dû cara polîs dihatin pirtûkxanê, ji bo azardanê hemû pirtûkan diavêtin erdê û ez jî bi xwe re dibirim. Vê yekê bandor li mişteriyan jî kir; zêdetir haj xwe hebûn û hatina wan jî kêm bû. Carna ku mişterî li wê bûn, em hemû dibirin. Dikandarê cîran guman dikirin û dixwestin bizanibin ka em çi dikin. Lê piştî wan hersê salan, êdî polîs nema hatin. Me jî êdî bi awayekî baş karî pirtûkên xwe bifiroşin.

***Ez dibêjim piştî wan hersê salan weşanxaneyên kurdî jî zêde bûn...***

Selahedîn Bulut: Belê, weşanxane zêde bûn û pirtûk jî zêde bûn.

***Baş e qalîte? Çap, tîprêzî, rastkirin, naverok, ravekirina ne rêkûpêk û tdw?***

Selahedîn Bulut: Qelîta çapê nizim bû, pirsgirêka redaksîyonê hebû, wêne ne saf bûn lê wek naverok pirtûkên ku weşanxaneyên kurdî çap dikirin baş bûn. Weşanxane jî di warê teknîkî de di rewşeke xirab de dijiyan lê tiştek ji naveroka pirtûkê kêm nedibû. Pirtir li ser dîroka Kurdistanê pirtûk hebûn. Piştre çand û wêje.

***Tercîha xwendevanan çi bû?***

Selahedîn Bulut: Xwendevan, pirtûkên li ser ziman, gramera kurdî û ferhengê dixwînin. Piştî dîroka Kurdistanê û warên lêkolînan berê xwe dane mijarên wêjeyî. Pêşî hewldidan ziman fêr bibin û bizanin çiye. Ez dikarim bêjim ku mijarên rojevê û dîroka siyasî hemû demê bêhtir bala xwendevanan kişandiye.


***Di xebatên li ser ziman de navên ku zêdetir tên tercîh kirin kîne?***

Selahedîn Bulut: Pirtûka Gramera Kurdî ya Celadet Elî Bedirxan û Ferhenga Kurdî ya Zana Farqînî pir tên firotin. Kêmasiya me ya rastnivîs û ferhenga etîmolojîk heye. Ji ber ku heta niha jî zimanzanekî me tune ye. Nivîskarên me bêtir bi lêkolînan ve mijul in û metodolojî peyrew dikin.

***Nasandina pirtûkan û karê îlanê çawa dimeşe?***

Selahedîn Bulut: Di vir de ragihandin pir giring e. Dema îlana pirtûkekê derdikeve, mirov dibihîzin û dibînin. Di rojnameyên Tirkiyê de hinek pirtûkên kurdî di rojnameyên wek Radîkal û Tarafê de tên nasandin. Lê ne hemû pirtûk. Ji xwe rojnameyên me jî nînin ku pirtûkên me bidin nasandin û wan rave bikin. Di cîhana elektronîk de, em di astekî baş de ne. Malper gelekî karîger in. Ji ber ku fahmkirina me ya ragihandinê ji fikra "partîtiyê" tê, bi awayekî baş rojnamevanî jî nayê kirin. Di ragihandina me de karê nasandin û îlankirina pirtûkan zêde bandora xwe tune. Hêviya me ku em vê derbaskin.

## Simbêl wek nîşana mêraniyê



**Tîkrît (Rûdaw)** - 'Mêrekî eger sondekî dixwe pêşî dest dide simbêla xwe.' Simbêl li Îraqê girîng in. Li gor reporteke ku di malpera Niyûzmatîk de hat weşandin. Bi taybetî li gundên Îraqê mêr serbilind in bi simbêlên xwe û cihê rêzgirtinê ye.

Li gor Saleh El Haydar (60) ku xelkê bajaroka Dore, ser bi Tîkrîtê ye, giringiya simbêl li Îraqê dîroka xwe heye: "Di serdema bab û bapîrên min de gava ku simbêl cihê xwe girtibû nav civakê, dohnê goştê lê didan û simbêla xwe radizandana. Eger kesekî hêjar bûya û mecala wî tunebûya ku goşt bikire û dohn li simbêlê bike bi deyndarî ji kesek dî werdigirt û beriya çûyîna bo dîwexana şêxê eşîretê simbêla xwe pê bi dohn dikir."

El Haydar pê de diçe: "Bi vî awayî gava xelk delalî û biriqîna simbêlên wan didît hest pê dikirin ku mêrek e ku goşt xwariye û dikare ji malbata xwe goşt bikire."



## Divê warkor zêdetir seksê bikin!

**Sidney –** Lêkolînerên Awûstralyayî, li ser bêhêziya mêran lêkolînekî çêkirin û gihîştin wê encamê ku, ev pirsgrêk dikare bi zêdetir seksê çareser bibe. Encamên vê lêkolîna ku, li Klînîka IVF ya Sydneyê hatin meşandin, di civîneke Komeleya Embriyolojî ya Ewrûpayê de, li Amsterdam a bajarê Hollandayê hat eşkerekirin. Dîrektorê lêkolînê David Greening, diyar dike, ew di encama lêkolînê de bi ser ketine ku, 118 mêrên qelîteya spermên wan qels bûne, piştî hefteyekê, her roj bikaribin seks bikin. Greening dibêje, seksa nîzamî tesîra xwe piştî hefteyekê dide nîşandin û ji sedî 81 kesên ku spermên wan bêqelîte bûye, di dawiya vê lêkolînê de, qalîteya spermên Xwe ji sedî 12 baştir kirine. David Greening, dibêje ew êdî li cotên warkor pêşniyaza zêdetir seksê dike.

Tiştên ku rê li ber warkoriyê vedikin, gelekin Ji qrêja hawîrdorê heta alqolê, ji cixarê heta hin dermanan, herwiha karê ku mirov dike, gelek tişt rê li ber warkoriyê vedikin. Hatiye tesbîtkirin ku, hewaya germ jî hijmara spermên zindî kêmtir dike. Şalên teng, ji bilî jinan li cem mêran jî dibe sedemê pirsgrêkên zayendî. Pispor balê dikşînin ser nexweşiyên agirî, ceger û gurçikê û dibêjin ev nexweşî qelîteya sperman dadixînin jêr. Ji bilî van, nexweşiya şekir, nexweşiyên nörolojik, di encama travmayan de xesar dîtina movikan, emeliyatên mîzdankê jî dibin sedemên negatîf yên avabûna sperman. Herwiha, hin derman û radyasyon jî dikarin xesarê bidin hêlikan û bibin sedemê bêhêziyê.

Bi milyonan mêr gazin ji bêhêziyê dikin. Li gor lêkolînekî ku li Emerîqayê hatiye kirin jî sedemê herî girîng yê warkoriyê, netevgeriya fizîkî ye. Li alî din, pirsgrêkên temenî, nerihetiyên dil û damar rîska bêhêziyê zêdetir dike. Lêkolîna ku li Fakulteya Bijîjkî ya Baltimore John Hopkins hatiye lidarxistin de jî hatiye tesbîtkirin ku, ji sedî 90ê warkoran, xwedî nexweşiya dil û damar ne. Nîvê wan jî, xwedî nexweşiya şekir in. Ji bilî diyabetê, tansiyona bilind, kolesterola bilind û cixare jî sedemên ku rê li ber warkoriyê vedikin tên nîşandin.

Li Emerîqayê, herî kêm 18 milyon kes bi pirsgrêka bêhêziyê re rû bi rû ne. Li welat, di navbera kesên 20 salî de, jimara kesên bêhêz jî, ji sedî 18 ye.

# "Bazirganî bi muzîka kurdî nekin"



**Sîrwan H. Berko**

**Gävle/Swêd (Rûdaw)** - Heta ku mirov bigîjê mala Ciwan Haco pêwîst e mirov pêşî xwe bigihîne balafirgeha Stockholm a paytexta Swêdê. Bajarê Gävle 170 km li bakûrê Stockholmê ye. Ev bajarokê li ser deryayê di herêma dîrokî ya Gästrikland de ye û paytexta parêzgeha Gävleborgs Län e. Li Gävle 70 hezar kes dijîn. Xaniyê hunermendê kurd Ciwan Haco li taxeke li qiraxên bajêr e.

Îroj rojek ji rojên pir kêm e ku germahî serdana Gävlê dike. Li derve dereca germbûnê 32 ye. Em li derve rûdinîn. Piştî taşteyeke sivik (nan, masî û qehwe) di hewşê de em dest bi hevpeyvîna xwe dikin. Herdû keçên Ciwan, Lorîn (9) û Roza (7), carê serê xwe di derî re derdixin, destên xwe datînin ser devên xwe û dikenin. Ew dizanin ku bavê wan muzîkvan e, wan komek ji stranên wî jî ji ber kirine, lê xuya dike ku ew hîn nizanin ku ew keçên superstarekî kurd in.

***Rûdaw: Kak Ciwan, ji te re "Mîrê Popa Kurdî" tê gotin. Tu vê sîfetê çawa dibînî?***

Ciwan Haco: Ev sîfeteke şaş e. Muzîka min ne pop e, lê bêtir ethno-rock e.

***Rûdaw: Ev demek e tu bêdeng î. CD'ya te ya dawî „Off" berî sê salan derket. Sedema bêdengiya te çiye?***

Ciwan Haco: Dibe ku ji ber min gelek kar kiriye. Di van sî salên dawî de min çardeh kasêt û CD derxistine. Bi rastî ne hejmareke hindik e. Ji bo vê dengiyê ti plan tune ye. Ez xwe hinekî rehet dikim û di şevên kurdî li Ewrûpayê de hema bêje nema derdikevim. Ez tenê beşdarî konsêrtan dibim.

***Rûdaw: Tu niha çi karî dikî?***

Ciwan Haco: Ev çend mehin ez wekî mamosteyê muzîkê kar dikim. Di jiyana min de ev yekem car e ku ez ji bilî muzîkê karekî din dikim. Ez di dibistana muzîkê ya bajarê Gävle de zarokên Kurdan fêrî muzîkê dikim. Bêhna min fireh dibe û ez kêfxweş dibim ku ez dibînim bê çawa zarok fêr dibin.

***Rûdaw: Qey muzîka te nan nade te?***

Ciwan Haco: Îroj tiştê herî erzan di nav civaka kurdî de muzîk e. Ev rastiyeke tehl e. Sûcê hemû partiyên kurdî di vê meselê de heye. Wan wilo lê kiriye ku muzîka kurdî ji bacanên sor erzantir bibe. Bazara muzîka kurdî tuneye, eger hebe jî, ketiye nav destên partî û dezgehên kurdî de. Ez ji wan re dibêjim: Bazirganî bi muzîka kurdî nekin. Dev ji muzîka kurdî berdin. Şerm e!

***Rûdaw: Tu yê kînga berhemeke nû amade bikî?***

Ciwan Haco: Min biryar daye ku di payîzî de CD'yeke nû çêkim. Ev berhem wê pir cuda be ji berhemên vê dawiyê. Ezê stranên xwe yên kevn, mîna "Emîne Emîne", bi rengekî nû û stîla vê demê tomar bikim. Hîn ez çardeh-pazdeh salî bûm min ev stran digotin.

***Rûdaw: Dema TRT6 hate vekirin, ji te jî hat xwestin ku tu tê de kar bikî. Te hingê got ku tu dixwazî ji bo biryara xwe demê bistînî. Te çi biryar da?***

Ciwan Haco: Ez vekirina TRT6ê baş dibînim. Bi milyonan Kurd fedî dikin ku bêjin ew Kurd in. Ku îroj dewleta Tirkiyê radibe û kanaleke televîzyonê ya kurdî vedike, teqez wê bandoreke wê ya nefsî li ser miletê kurd hebe. Ji bo ku ez lê kar bikim divê miletê min bêje ku tiştekî baş e ku dewletê ev televîzyon ji me re vekir. Hingî ji min re hesanîtir dibe ku ez herim. Gelek kes îroj hene ku di nav partiyên kurdî de kar dikin, pereyên xwe ji dewletê distînin: şaredar, mamoste, pijîşk... Lê dema hunermendek pereyên xwe ji dewletê bistîne, nabe. Ez vî tiştî fahm nakim.

***Rûdaw: Ev heft meh in ku TRT6 weşana xwe dike. Ta niha ji bo propagandaya dewletê nehatiye bikaranîn, wek ku di destpêkê de guman dihate kirin. Çi te disekinîne ku tu di TRT6ê re kar nekî?***

Ciwan Haco: Helwesta xelkê dihêle ku ez hinekî bisekinim. Ez pir westiyam ta ku ez giham vê asta niha. Qet ne hesan bû. Ez naxwazim vî tiştî bi hesanî wenda bikim. Hîn min negotiye 'erê', lê hîn min negotiya 'na' jî. Em di têkiliyê de ne.

***Rûdaw: Di dema dawî de kanalê muzîkê yên kurdî mîna Vîn Tv û Korek Tv jî vebûne. Tu di xwe re dibînî ku tu di van kanalan de kar bikî li şûna TRT6ê?***

Ciwan Haco: Çima na? Eger derfetên baş peyda bibin, ezê serbilind bim ku di van kanalan de yan jî yên dî de kar bikim. Lê mixabin gav nayên avêtin. Ez dikarim programeke Kurdistanî ya li ser asta navnetewî çêbikim.

***Rûdaw: Tu amade yî ji bo karekî wiha biçî Kurdistanê bijî?***

Ciwan Haco: Ez sedî sed amade me. Çima ne amade me? Lê bi belengazî program çênabin. Ez nikarim tenê bi tembura xwe programekê çêkim. Herwiha divê azadiya min hebe. Ez nikarim bi şert û şirutan kar bikim.

***Rûdaw: Di van rojan de li Başurê Kurdistanê amadekariyên ji bo hilbijartiên parlamento û serokatiyê pêk tên. Tu rewşa wir dişopînî?***

Ciwan Haco: Ez di reya internêtê re nûçeyên Kurdistanê dixwînim. Em bi hêviyeke mezin li wî beşê Kurdistanê dinerin û hêvîdar im ku ev ezmûna serkeftî têk neçe. Destkevteke mezin ketiye destê Kurdan. Ev destkevteke Kurdistanî ye. Lê rexneyên xelkê hene. Hêviya min ew e ku haya berpirsan – ez bawer im ku wan berpirsyariya xwe fahm kiriye - ji miletê wan hebe. Pêwîst e ew li miletê xwe û rexneyên wan guhdarî bikin. Pêwîst e demoqratiya heyî xurtir bibe û biryar bikeve destên dezgehan, ne tenê di destên partiyan de be. Hêviya min ew e ku yekîtiya miletê kurd xurt bibe. Gerek Kurd ji yekbûna xwe ya netewî netirsin. Pirsa Kurdan tenê li beşekî Kurdistanê çareser nabe. Yan emê tevde azad bin, an kesek azad nabe.

***Rûdaw: Tu planên te ji bo çûna Başurê Kurdistanê hene?***

Ciwan Haco: Ez ji bo pêkanîna konsêrtekê li Hewlêrê hatime vexwendin. Plan ew e ku ez hefteyekê berî roja hilbijartinan di 25ê vê mehê de li Hewlêrê bim.

www.arsivakurd.org

# “Bi vê mantiqa niha ya Tirkiyê şer naraweste”



***Rûdaw: Hûnê wek DTP tevlî Konferansa Kurd ya Hewlêrê bibin?***

Ahmet Türk: Bi nerîna me girîng e tevahiya siyaseta Kurdî formula daxwaziyên wan yek be. Lewra divê em bi hevre rûnîn, da em bikaribin pakêta daxwaziyên xwe bi hevre bixin ber çavê Awrûpa, Amerîka û cîhanê. Bakûr dixwaze çand û nasnameya wê çawa be û ev li Tirkiyê çareser dibe. Em dixwazin bi zimanê xwe bixwînin, kêmasiyên xwe yên aborî çareser bikin. Li Bakûrê Kurdistanê desthilateke otonom hebe û desthilat bê dabeşkirin. Kurdên parçeyên din jî bêjin ev daxwaziyên me ne. Li Başûrê Kurdistanê desthilateke federalî heye, Kurd hevkariya wê bikin û ew mafên di Destûra İraqê de hatine pejirandin bên cîbicîhkirin. Bahsa zordariya ser Kurdên rojava bê kirin, daxwaziyên wan bên diyarkirin. Ger Kurd vê yekê bikin, bihêz dibin û hemû cîhan guhê xwe dide wan. Lewra ev kongre girîng e û emê beşdar bibin.

***Rûdaw: Hinek caran dibêjin wê PKK beşdar bibe û carna jî dibêjin nayê vexwendin, di vê derbarê de raya we çiye?***

Ahmet Türk: Em dixwazin hemû aliyên Kurdî beşdar bibin, hemû aliyek boçûnên xwe bîne ziman, piştre lijneyekî bê pêkanîn bo hilbijartina wan nerînan û yekxistina wan di pakêtekê de. Lewra ger PKK neyê vexwendin û beşdar nebe pirsgirêk derdikeve. Ji ber ew hêzeke bi bandor e û çek di destê wan de ye. Divê em bizanin raya wan çiye.

***Rûdaw: Niha pir bahsa pêwistiye çekdanîna PKK'ê tê kirin. Li gor we çekberdana PKK'ê baş e?***

Ahmet Türk: Em hîç zemîneke çekdanînê nabînin. Dema çek tê danîn ji ber siyaseta Tirkiyê ye yan jiber Kurd e? Ger projeyeke çareseriya siyasî ya aştiyane ya dewleta Tirkiyê hebe, wê demê emê ji Tirkiyê re bêjin 'çek deyne,' ger ew hebe hemû Kurd dikarin ji PKKê re bêjin 'êdî bes e çek deyne.' Em hemû duxwazin ew şer bê rawestandin. Bi vê bîrkirin û mantiqa niha ya Tirkiyê şer naraweste.

***Rûdaw: Baş e divê çi bê kirin, bo çêkirina zemîneke çareseriya aştiyane, ji ber Kurd jî bi wî şerî nikare dewleta Tirkiyê ji Kurdistanê derxîne?***

Ahmet Türk: Divê em rûyê hemû kesî ji cîhanê re eşkere bikin, wê demê dûrû eşkere dibin. Bila ew konferans bê girêdan, ger daxwaziyên her parçeyekî Kurdistan ne rewa bûn, bila rexne li me bigre. Wê demê derdikeve ku daxwazên Kurdên Bakûr rewa ne di çarçoveya dewleta Tirkiyeyê de. Sedem çiye nayên cîbicîhkirin? Em dikarin modêla çareseriya pirsgirêka Herêma Katalonya li Îspanya, modela Îrlanda û gelek cihên din jî gotûbêj bikin. Ne rast e Mam Celal hertim dibêje 'pêwist e PKK çek deyne,' em hemû dixwazin çek nemînin. Lê belê ji bo çek nemînin, Mam Celal ka projeya te çiye, daxwaza te ji dewleta Tirkiyê çiye? Ger ji bo mafê gelê Kurd pêngav navêjin ew tiştê tu dibêjê Kurd qebûl dikin? Divê ev rastî bê gotin. Dema Mam Celal dibêje 'bila şerê çekdarî raweste,' em dibêjin 'heq e Mam Celal wî tiştî dibêje,' lê projeya wî tuneye. Wate dema Mam Celal dibêje 'pêwist e şerê çekdarî raweste' divê ji dewleta Tirkiyê re jî bêje 'divê hûn jî pêngavekê biavêjin.' Wê demê em dikarin gotûbêj bikin û bizanin ew proje heta çi astekî dilê Kurd dixe cîh û gelo dewlet dikare cîbicîh bike.

***Rûdaw: Serokê Herêma Kurdistanê Mesûd Barzanî dibêje, 'ger Tirkiye projeyeke çareseriya aştiyane pêşkêş bike û PKK çek nedeyne wê demê em dibêjin tu şerxwaz î.' Hûn ev helwêstê Barzanî çawa dibînin?***

Ahmet Türk: Em jî heman tiştî dibêjin. Rast e herdema projeyeke sivîl mafê Kurd misoger bike, wê demê em hemû Kurd ji PKK'ê re dibêjin 'şerê çekdarî bes e.' PKK bi xwe jî dibêje 'ger ev şer pênc salên din jî dirêj bibe, divê ev pirsgirêk her bi rêyên aştiyane bê çareser kirin.' Dibêjin bila ji bo çareseriyê projeyeke aştiyane bê danîn, em jî amade ne.

***Rûdaw: Ji aliyê samanê petrolê ve Başûrê Kurdistanê pir dewlemend e. Tirkiye jî bo Başûrê Kurdistanê reya herî baş e. Yek herêm ku bikaribe feydê bide Tirkiyeyê Başûrê Kurdistanê ye. Bi vî awayî Başûrê Kurdistanê dikare çi ji Tirkiyê bike bo berjewendiyên parçeyê herî mezin yê Kurdistanê û çareseriya aştiyane ya pirsgirêka wê?***

Ahmet Türk: Bi rastî ev pir girîng e, dema mêjiyek bi rêzdarî berê xwe bide bratiya gelan, berjewendî di wê de ye. Em dixwazin Tirkiye bi çavê bratiyê berê xwe bide Kurdên Başûr'ê Kurdistanê. Peywendiyên aborî û çandî di navbera herdû aliyan de çêbibin. Em ne li dijî vê ne. Herwiha em dixwazin peywendiyên bihêz girêdin. Lê belê peywendî ne ji bo wê yekê bin Kurd bê deng bikin. Ew mantiq nebe: Peywendiyan bi Kurdên Başûr re çêdikim, bo Kurdên vir bê deng bikim. Ev mêjî û têgeheke teng e, ji ber ger sibe Kurdên vir bê deng bibin, Kurdên wir jî perîşan dibin. Lewra divê dewleta Tirk û Tirk bêjin 'Kurd brayê me ne û peywendiyên Kurd û Tirk di dîroka Rojhilata Navîn de pir qedîm in.' Divê rêz li gelê wî parçeyî bigirin ku îro xebatê bo parçeyên xwe dikin. Wê demê bandorê li Kurdên Tirkiye jî dike bo pirsgirêk çareser bibe. Ji bo pirsgirêk jî çareser bibe, rê vekin. Lê ger Tirk bi wî mêjî berê xwe bidin ku Kurd pêkhateyekî bi pirsgirêk in û wê jî kontrol bikin. Bi wî awayî nêzîk bibin, bi rastî tiştekî ne baş e.

***Rûdaw: Hûn di vî warî de siyaseta ku Mesûd Barzanî, Mam Celal û Nêçîrvan Barzanî dimeşînin çawa dibînin?***

Ahmet Türk: Ne rast e niha em siyaseta serkirdeyan rexne bikin. Lê daxwaziya me ew e, em çiqasî diyaloxa bi gelê Tirk re dixwazin, berî hemû tiştekî diyalox di navbera Kurdan bi xwe de hebe.

***Rûdaw: We çiqasî ew dîtibin, nabînin êdî ew jî bi giştî rêz li DTP'ê digrin, jiber desthilata netewî ya Bakûrê Kurdistanê di destê we de ye?***

Ahmet Türk: Em serkeftinê ji brayên xwe yên Başûr re dixwazin. Em dixwazin roj bi roj bihêz bibin û di warê demokrasiyê de pêngavên mezin bavêjin. Em dixwazin bibin hevkar da bi diyaloxê li herêmên derveyê Başûrê Kurdistanê jî pirsgirêka Kurd çareser bibe. Hevkarê çareseriya siyasî ya pirsgirêka Kurd bin.

***Rûdaw: Tirkiye dikare gelek pirsgirêkan ji Başûrê Kurdistanê re çêke û sedema serekî ya cîbicînebûna maddeya 140ê jî Tirkiye ye. Wek li Parlamena Tirkiyê fraksiyona we heye, hûn dikarin çi lobiyekê ji Başûrê Kurdistanê re bikin?***

Ahmet Türk: Em dizanin siyaseteke heye dixwazin roj bi roj mafê Kurd li wir kêm bikin, kontrol bikin û rêgiriyên cîbicîbûna maddeya 140ê ne tenê Hikûmeta İraq'ê bû, destê Tirkiyê jî tê de heye. Em dibêjin bo her pirsgirêkeke İraqê, pêwist e gelê İraqê Kurd û Ereb di navxwe de pirsgirêkên xwe çareser bikin. Hîç peywendiyekî li derve çênebe, bo pêşxistina biwarên mafê mirov û demokrasiyê hevkariya derve hebe, lê ne bi wê yekê re ne, li ser mafê Kurd û Ereb peywendî û destwerdana derve hebe.

***Rûdaw: Di wî warî de hûn dikarin li nav Tirkiyê û parlamenê tiştekî ji Başûrê Kurdistanê bikin?***

Ahmet Türk: Ger ew melhema me hebûya me yê pêşî di serê xwe daba. Wî wextî dema me serê xwe derman kir, me yê berê xwe bidayê ka em dikarin çi feydeyekê bighînin Herêma Kurdistanê. Lê hertim em eşkere dibêjin divê Tirkiye hîç lîstikekî di navxwe ya İraq'ê de neke.

***Rûdaw: Di hevdîtina we û Abdullah Gül de we qet bahsa Herêma Kurdistanê kir?***

Ahmet Türk: Bi rastî dema bahsa pirsgirêka Kurd tê kirin, bahsa Başûr, Başûrê Biçûk û Îranê jî tê kirin, bahsa rewşa Kurd ya li wan deran tê kirin. Lê em di wê baweriyê de ne heta pirsgirêka Kurdên Bakûrê Kurdistanê çareser nebe, tu garantiyekî bo hîç parçeyekî Kurdistanê tuneye. Ji ber çandeke demokratîk li Tirkiyê heye, ger em wê çanda demokratîk nexin tevgerê û bilind nekin, em nikarin guhertinên mezin li parçeyên din yên Kurdistanê bikin. Divê ew rastî bê zanîn.

Direjiya Hevpeyvîna Serokê DTP'ê Ahmet Türk di www.rudaw.net de.

# “Eger kesên adlî bişînin İmraliyê wê Kurd reaksiyoneke mezin nîşan bidin”

***Rûdaw: Birêz Ömer Güneş, meseleya kesên ku li cem Abdullah Öcalan bên bicîhkirin niha di çi astî de ye? Ji bo vê yekê heta niha çi hatiye kirin? Li gor texmînan an jî bi awayê fermî, dewlet çend kesan dişîne cem Öcalan?***

Parêzer Ömer Güneş: Heta niha li ser hejmara kesên ku wê bişînin İmraliyê agahî nîne. Înşeata ku li giravê tê çêkirin li ber qedandinê ye. Lê yên ku cezayê mûebbetê wergirtine dikarin herin wê derê. Ev kes wê ji aliyê Wezareta Dadê ve bêne hilbijartin an jî wê xwe bi xwe serlêdana çûndina İmraliyê bikin. Ya girîngtir, bi tenê girtiyên ku ji siyaseta Kurd hatine girtin wê bêne hilbijartin.

***Rûdaw: Yanî tawanbarên ne siyasî naşînin İmraliyê?***

Parêzer Ömer Güneş: Qanûn rê dide vê yekê. Lewra dibêjin 'yên ku cezayên giran stendine.' Lê belê ji aliyê siyasî ve bawer nakim ku tişteke wisa bibe. Temînateke wisa nehatiye dayîn, lê texmîna min bi vî rengî ye. Çimkî dewlet mekanîzmayek e û li menfaeta xwe difikire. Eger ji bilî kesên siyasî kesek bête şandin, wê dewlet bikeve tengasiyê. Wê gelê Kurd reaksiyoneke mezin nîşan bidin li dijî vê biryarê. Dewlet vî tiştî nade ber çavê xwe. Hêviya me jî erênî ye, lê dîsa jî wê dewlet çi bike, hîn nayê zanîn.

***Rûdaw: Siyasetmedarê Kurd Mihemed Emîn Pencewînî çendek berê di hevpeyvînekê de weha digot; “Tirseke wisa heye ku dewlet kesên ji doza İslamê hatine girtin bişîne cem Öcalan. Ji bo ku ew bixwe jî piştî demekê bibe îslamîst!” Mînakekê ji Îranê jî dide. Behsa girtiyê bi nav û deng Îhsan Teberî dike. Sosyalîst bû, kesekî pir mezin bû. Girtiyên İslamî birin cem wî, piştî ku ew hat berdan got 'ez Misilman im' berê ateîst bû. Lê Pencewînî, fîkra xwe jî dibêje ku dewlet nikare Öcalan bike İslamîst û fikra wî biguhere. Fikra te çi ye li ser vê mijarê?***

Parêzer Ömer Güneş: Tabî mirov dikare her tiştî bêje lê ez ne di wê baweriyê de me. Îhtîmaleke wisa jî tuneye. Li gor qanûnan dewlet dikare kesên İslamî jî bişîne, kesên çepgir jî û kesên ji dozên adlî jî bişîne. Lê wek ku min got, ev tişt tu menfaetê nade dewletê. Dewlet vî tiştî nade ber çavê xwe. Ji aliyê siyasî ve hîn gavekî nehatibe avêtin jî, ji aliyê psîkolojîk ve hewayeke wisa erênî heye. Eger gaveke wisa bê avêtin wê ev bibe saboteya çareseriyê. Wekî din birêz Öcalan bi mejiyê xwe, ne di wê astê de ye ku bikeve bin bandora fîkrên cûda. Di salên xwe yên girtîgehê de, bi tevahî li ser xwendinê disekine, li ser pêşveçûna zanîstiya civakî disekine. Bi taybetî jî li ser zanîsta felsefî, li ser mîtolojiyê, li ser dîn, li ser fîlozofên 40-50 salên dawî disekine. Ji aliyê dîn di zanîsta civakî de pir pêşveçûye.



***Rûdaw: Daxwaza anîna girtiyan bo cem wî, yekem car ji hêla wî bixwe hatibû kirin?***

Parêzer Ömer Güneş: Daxwazeke wî yê wiha hebû. Li gorî qanûnan keseki/a girtî dikare sê kesan bixwaze cem xwe, ji bo hevdîtinê. Lê ne ji girtiyan, yanî ji kesên ji jiyana sîvîl. Me jî ji bo vê yekê serî li dewletê dabû. Ev daxwaz nehatibû qebûlkirin. Lê ji bo xwestina kesên girtî daxwazeke birêz Öcalan çênebû. Dema 5-6 kes bêne şandin, wê tecrît hinekî sist bibe lê ji holê ranabe. Ji aliyeke din, bi pêkhatineke wiha êdî gîrtîgeha İmraliyê mayînde dibe.

***Rûdaw: Naxwe ji bo Öcalan wateya rakirina tecrîtê çi ye?***

Parêzer Ömer Güneş: Rakirina tecrîtê ji du astan pêk tê. Ya pêşî divê tiştên ku di zagona bingehîn de hatine nivîsîn, ji bo wî jî di pratîkê de pêk were. Mesela mafê xwendina rojnameyan, mafê hevdîtina sê kesan, -yanî ji bilî malbat û parêzêran- Ya duyem jî divê çend kesên din yên girtî jî li balê bin û her roj bikaribe bi wan re bikeve têkiliyê. Tabî ez van tiştan li gorî daxwaza Kurdan nabêjim. Li gor daxwaza Kurdan divê Öcalan serbest bê berdan.

***Rûdaw: Tiştên ku heta niha hatine kirin çine? Li ser mijara şandina girtiyan çi hatiye kirin? Mesela te behsa înşeatekê kir…***

Parêzer Ömer Güneş: Niha li wê derê înşeatekî tê çêkirin. Ji dû avahiyan pêk tê. Yek, ji bo girtiyan e . Yek jî li kêlekê ye ew jî ji bo rayedaran e. Înşeat niha li ber xelasiyê ye. Bi texmîna min wê înşeat di nava dû mehan de biqede.

***Rûdaw: Rayedar çi dibêjin? Yanî wezareta edaletê, berpirsyarên girtîgehê çi dibêjin? Wê kengî ew kes werin cem wî? Gotineke fermî heye an na?***

Parêzer Ömer Güneş: Gotineke fermî niha tuneye. Gotineke dîrokdayînê tuneye. Wezîrê Edaletê yê berê Mehmet Ali Şahin gotibû wê di meha gulanê de xelas bibe. Lê ev yek pêk nehat. Ji bo ku di resmiyetê de tiştek tuneye, em li kiryaran mêze dikin. Bi texmîna min wê payîzê xilas bibe.

***Rûdaw: Bi ya we çend kes bişînin cem muwekîlê we baş e?***

Parêzer Ömer Güneş: 10 kesan bişînin baş e.

***Rûdaw: Û divê ew kes girtiyên siyasî bin?***

Parêzer Ömer Güneş: Kapasîteya giravê jî zêde tuneye. Lê kêm kes biçin jî pirsgirêk e. Ji bo vê divê herî kêm 10 kes biçin. Ya girîng ev kes jî divê ji siyaseta Kurdan bin. Ku wisa nebe em napejirînin û mesûliyeta reaksiyona gelê Kurd li ser dewletê ye.

***Rûdaw: Niha ne diyar e wê kengî bicihkirin pêk were?***

Parêzer Ömer Güneş: Ne diyar e.

***Rûdaw: Li ser vê yekê sazî û dezgehên ku daxûyanî dane hene gelo? Kê çi dibêje? Mesela Komela Mafê Mirovan (İHD), Saziya Şopandina Îşkenceyê ya Ewropayê, Dadgeha Mafê Mirovan li ser vê yekê tiştek gotine heta vêga?***

Parêzer Ömer Güneş: İHD daxuyanî da. Komeleya Efûyê ya Navneteweyî daxuyanî da. Komeleya Girtiyan daxuyanî da. Bi taybetî dibêjin bila girtîgeha İmraliyê bigihêje standardên mafê girtiyan a navneteweyî. Ew kesên bêne şandin jî divê di vê çarçovê de bêne şandin.

***Rûdaw: Daxwaza we ya ji bo girtina Girtîgeha İmraliyê jî tuneye gelo?***

Parêzer Ömer Güneş: Daxwaza tevahiya gelê Kurd bi vî rengî ye. Lê taleb a me ya niha rakirina tecrîdê ye.Yanî daxwaza a me ya resmî ya niha ne girtina girtîgehê ye. Ji ber ku niha em nikarin tiştekî wisa bixwazin. Ji bo daxwazeke weha dem lazim e.

***Rûdaw: Yanî hûn dibêjin di riya azadiya Öcalan de ev rêyek e?***

Parêzer Ömer Güneş: Gelek kes wisa şîrove dikin. Ez jî wisa difikirim. Wek gaveke erênî bi nav dikim.

***Rûdaw: Çareseriya azadkirina Nelson Mandela jî ne wiha bû?***

Parêzer Ömer Güneş: Belê. Em jî gava meseleya Mandela tînin bîra xwe. Dû rê li pêş me xuya dibin; yek an wê Öcalan wek Mandela serbest bê berdan an mesela Kurd wê herwek xwe bimîne.

www.arsivakurd.org

# "Civak bê azadbûna jinan pêşve naçe"




İsmet Sîwereklî

**Rûdaw (Berlîn)** - Aso Agace jineke Kurd e û li Almanyayê ji bo doza jinên Kurd nêzî sî sal in xebatê dike. Di encama xebatên xwe de pir zahmet kişandiye. Wan zehmetan ew nequtifandiye, çûye ser wan zehmetan û xebata xwe berdewam kiriye. Dewleta Almanan ji bo mafên jinên Kurd qanî kiriye û di dawiyê de bi navê "Hinbûn" navendeki perwerde û amojgariyê ji bo jinan û malbatên wan sazkiriye.

Aso Agaca wiha dibêjê: "Civak bi azadbûna jinan nikarê pêşde herê. Civaka me de jin ne azad in û ji bo vê me Hinbûn saz kiriye. Hinbûn ji bo azadbûna û pêşveçûna jina Kurd li Almanyayê xebat dike." Damezrêner û berpirsa Hinbûnê Aso Agace di derbarê xebata xwe de bersiva pirsên Rûdawê da.

***Rûdaw: Hînbûn kengî, li kû û ji alîyê kê ve hat sazkirin?***

Aso Agace: Navenda perwerde û amojgariya ji bo jin û malbatên wan Hinbûn di sala 1981an de li paytexa Almanyayê ji aliyê Wezareta Karûbarên Hundirin û bi alikariya Senatoya Berlînê wek projeyek li ser jinên Kurd li Berlînê pêk hat. Di pêvajoya projeyê de lêkolînên li ser jinên Kurd yên ku li Berlînê dijîn û li ser rewşa jinên Kurd li welatê wan ji aliyê civakî, çandî û siyasî pêk hatin. Ew lekolîn nêzî sê salan berdewam kirin. Di sala 1984an da proje bû fermî û navê Hinbûnê girt.

***Rûdaw: Hînbûn çawa tê fînansekirin û armanca wê çiyê?***

Aso Agace: Hinbûn ji 25 salan vir de ji aliyê desthilata Berlînê ve tê fînansekirin, ji bo ku seminar û projeyên ku ji jinên Kurd re alikariyê dikin bikaribin di ser wan bendan re bi hêsanî derbas bibin. Herwiha di nav wan projeyan de danasîn û hinkirina sîstema demokratîk ya Almanyayê ji heye. Wekî din danasîn û hinkirina edet, tore û zimanê Almanî ji heye, da ku ew bikaribin derfetên welatekî dewlemend û demokratîk ji bo xwe bikar bînin.

***Rûdaw: Di derbarê integrasyonê de xebatên we hene?***

Aso Agace: Em ji bo integrasyona bi civaka Alman re semineran li dar dixin, ji bo ku jinên Kurd ciranên xwe yên Alman baştir nas bikin. Herwiha em ji bo Almanan ji semineran li dar dixin, da ku ew ji Kurdan baştir nas bikin. Herwiha ji bo burokrat, siyasetmedar û polîsên Alman derbarê Kurd û Kurdistanê, sedemên penaberiyê, rewşa Kurdên li Berlînê û hwd...

Misoger e ku ev projeyên han geleki giringin û herî giring ji jina Kurd zanîna xwe zêde kir, bi xwe bawer bû û rola wê ya di civakê de guherî. Di seminerên me de jinên Kurd hîn dibin ku di demên berê de jina Kurd ji jinên welatên ciran gelek bi pêşdetir û xwediyê gelek mafan û di civakê de xwedî biryar bûye. Di civaka îro ya Kurdan de rewşa jinên Kurd geleki paşdemaye, hergav di bin destên mêran de ne û li benda destûra mêran in. Eger pêwîstî bi tevlibûna civat an ji çalakiyek hebe, divê ji mêran destûr bigre. Ev ji bo jinên Kurd yên li Almanyayê dijîn ji her wiha ye.

Hinbûn bi hezaran km ji Kurdistanê dûr e. Lê em li Berlînê bi jinên Kurd re dixebitin. Ew penaberên siyasî û koçber in an ji jinên ciwan yên ku li Berlînê ji dayik bûne. Hinbûn destek dide van jinan û rêberiyê dike ku ew bikaribin di nav civakê de bi hêsanî rêya xwe û cihê xwe di nav civaka Almanan de bibînin

***Rûdaw: Hûn, jinên Kurd yên li Almanyayê dijîn û yên bi we re kar dikin, ji ber karên xwe rûberê astengiyan dibin?***

Aso Agace: Jinên Kurd ji civakek feodalî tên. Di welatê xwe de, di nav malbatê de jinên Kurd xwedî gotin bûn. Di nav malbatê de eger biryarek bihate girtin, bê jinên Kurd nedihat girtin. Dema jina Kurd hat Almanyayê, di salên 1960an de wek jinên karkerên Kurd, di salên 80an û 90an de wek penaber, civaka Alman ji wê re xerîb bu û nedikarî jiyana xwe ya rojane wek li welatê xwe berdewam bike. Xwendin û nivîsandina wê tune bû û vêyekê ji bo vebûna berbi civaka Alman arîşe derdixist. Ji bo çareseriya kêşeyê ew dihatin cem me û me ji ji wan re alikarî dikir. Jinên Kurd bi vê alikariya me dikaribû di nav civaka Alman de jiyana xwe ya rojane bidomînin.

Astengiyên pêş karê me de ji aliyê pêwendidayînê de hebûn. Kesî berê wek îro me nas nedikir. Îro em digijin her çar parçeyên Kurdistanê û ji pirsgirêkên wan re dibin çare.

Civak û burokrasiya Alman jinên Kurd bi mafên wan yên wekheviyê zêde li ber çav nagire. Adet û toreyên civaka Kurd jiyanê li jinên Kurd teng dike, tim bindest dihêlê û wana weke tiştekî bêqîmet dibîne. Ji ber vê ji, jin bi xwe ji di nav pêvajoyê de bawer dike ku ew tişteke bêqîmet û bêhêz e, herwiha roj bi roj cesareta wan kêm dibe, baweriya xwe wenda dikin û xwe şûnda dikişînin.

***Rûdaw: Ji bo ku jina Kurd di nav malbat û civakê de neyê perçiqîn hûn kijan xebatan dikin?***

Aso Agace: Ji bo ku jina Kurd di nav malbat û civakê de neyê perçiqîn em semineran organize dikin û wê di vê mijarê de agahdar dikin. Seminervanên me jinên zanyar yên Kurd in. Ji seminerên me re zêde eleqe tê nişandin. Seminerên ku em organize dikin tenê keçên Kurd an ji jinên Kurd nayên, jinên biyanî û Alman ji tên van semineran û beşdar dibin.



Ji ber vê sebebê tevlibûna projeyên Hinbûnê yên li derveyî malbatê ji bo jinan pir giring û bi wate ye. Jinên Kurd di pêvajoya zanebûnê ya dirêj de her wiha bi bav, bira û mêrên xwe re ji di nav tekoşînê de bi pêş dikevin. Di nav vê pêvajoyê de jin û mêr bi hev re diguherin. Ev gereke wiha bibe. Ji bo Hinbûnê pir giring e ku ligel jinan, mêr ji biguherin, pêş bikevin û ev 25 sal in Hinbûn bi malbatê re dixebite û rê li ber hişyarbûna jin û mêr vedike.

***Rûdaw: Di demên dawîn de li Almanyayê jinên Kurd bi mijara cînayetên namûsê ketin rojevê. Hûn vêyekê çawa dinirxînin.***

Aso Agace: Li gor min, di civaka Kurdan de her dem cinayetên namusê hebûn. Çapemeniya Alman ji bi vê haydar bû. Jinên Kurd li Almanyayê pir tiştên baş kirin: bûn mebûs, bûn profesor û ji aliyê rêxistinbûnê ve di nav komeleyên Almanan de çalak in. Çapemeniya Alman li ser van tiştên erênî nanivisinê. Ser van tiştan me bi çapemeniya Alman re danûstandin kirin û me ji wan re got: "hûn bi van nûçeyên xwe pêvajoya integrasyona Kurdan xirab dikin." Piştî vê danûstandinê çapemeniya Almanî zêde ser van mijaran nesekinî, tenê medya bulvar car caran hin tişt anî rojevê. Wêneyê jina Kurd li Almanyayê li gor min mina berê 20 sala nine. Kurd li Almanya û Ewrûpayê bi mijarên pir baş tên nasandin.

***Rûdaw: Ji bo pêşerojê kijan projeyên we henê?***

Aso Agace: Projeya me ya pêşerojê ewe ku di navbera jinên li Almanya û Kurdistanê dijîn danûstandinekê çêkin û bi vê danûstandinê pirsgirêkên wan binin rojevê. Ji bo xurtbûna têkiliyên jinên Kurd û Alman projeyên nû amade bikin, bi wan projeyan di nav civaka Alman da ji jina Kurd re cihê wê yê baş çêkin.

# Hikûmeta Kurdistanê kujerê Benazê teslîmê Brîtanya kir



**London / Silêmanî (Rûdaw)** – Kujerê keça Kurd Benaz ji alî Hikûmeta Kurdistanê ve bo Brîtanya hat radestkirin. Roja dûşemê, 29ê Pûşpera 2009an, li Herema Kurdistanê li bajarê Silêmaniyê Mihemed Salih Eli ku bi kuştina Benaz Mehmûd dihat tawanbarkirin, bi firokeyeke taybetî ya Brîtanî ji Firokexaneya Navnetewî ya Silêmaniyê teslîmî polîsên Brîtanî hat kirin û ji bo dadgehkirinê ew vegerandin Brîtanyayê.

Benaz Mihemed Mehmûd Babekir Axa ya 20 salî ku rûniştvana bajarê Londonê bû, bûbû qurbana namûsparêziyê. Bênaz di despêka sala 2006an de ji aliyê bav û mamê û keseki din ve hatibû kuştin. Kuştina Benazê bi şêweyeki geleki berfireh ji aliyê çapemeniya Brîtanî ve giringî pê hat dayîn. Malbatê wê Benazê bê daxwaza wê dabû zewicandin. Piştî demeki ew ji aliyê malbata xwe ve hatibû tawanbarkirin ku peywendiya wê li gel kurekî bi navê Rehmet Suleymanî heye û bi wê sedemê ji ew hat kuştin.

Di Nîsana 2006an, polîsên Brîtanî termê Benazê di nav cantayeki de li nêzîk parkeke bajarê Birminghamê ditibûn. Piştî lêkolînan, diyar bû ku di kuştina Benazê de tiliya bav û mamê wê û keseki bi navê Mihemed Salih Eli hene. Lewma di meha Pûşpera 2007an de dadgehê biryara zindanikirina muebetê ji her sê tawanbaran re birri. Di vê navberê de ji kujeran Mihemed Salih Eli ji Brîtaniyayê reviya Kurdistanê.

Piştî polîsên Brîtanî daxwaz ji Dadgeha Silêmaniyê kirin ku Mihemed Salih teslîmê wan bikin, di 29e Pûşpera 2009an de Hikûmeta Kurdistanê, tawanbarê navbirî bi firokeyeke Brîtanî ya taybetî ji Silêmaniyê vegerandin Londonê.

Biryare di 7ê Tirmeha 2009an bi tawana gefa kuştinê li hevalê Benazê, dest bi darezandina wî bê kirin.

Berdevkekî dadgeha Brîtanî ragihand ku li gor lihevhatina sala 1933an ya di navbera Îraq û Brîtanya de, wan daxwaza danedesta Mihemed Salih kiriye. Çend rêxistinên bi mafên mirov û jinan eleqedar destxweşî li biryara Dadgeha Silêmaniyê kirin ku ji bo dadgehkirinê wan ew tawanbar teslîmê Brîtanya kiriye.



# Jinên Hollywoodê wek derbxaneyan kardikin

**Almanya** – Kovara Emerîkî Forbes, lîsteya 10 lîstokvanên jin yên par herî zêde qezenckirine, weşand. Li gor kovarê, Angelina Jolie, di 12 mehên dawî de 27 milyon dolar qezenc kiriye. Jennifer Aniston a bi Brad Pitt re 5 sal zewicî mayî û îsal ji bi fîlmê "Marley & Me" serkeftinek mezin bidestxisti, bi 25 milyon dolaran ket rêza duyem. Meryl Streepa xwediya xelata Oscarê ji, bi fîlmê "Mama Mia!" û ji reklaman 24 milyon dolar berhev kir û bû sêyemîn.

Di lîsteya 10 aktrîsên Hollywoodê yên ku herî zêde qezenc dikin de, leyistokvanên din weha ne: Sarah Jessica Parker (23 milyon dolar), Cameron Diaz (20 milyon dolar), Sandra Bullock û Reese Witherspoon (15 milyon dolar), Nicole Kidman û Drew Barrymore (12 milyon dolar), Renee Zellweger (10 milyon dolar).

Li gor lîsteya kovara Forbesê, ku di meha sibatê de dabû xwuyakirin; Angelina Jolie, di nav stêrkên Hollywoodê de, yek ji 10 kesên hasilata wan ya gişeyê herî bilind e"

Li gor lîsteya Forbesê, Will Smith yekemîn e û bi 9.8 pûanî Angelina Jolie, Brad Pitt, Johnny Depp û Leonardo DiCaprio ji rêza duyem parvedikin.

Li gor encama lêkolînê, ku bi beşdariya 150 kesên di sektora şahînetê de cih digrin pêkhatiye, 5 kesên mayî ji bi rêzê weha ne:Tom Hanks, George Clooney, Denzel Washington, Matt Damon û Jack Nicholson.

Angelina Jolie û Brad Pitt, milyon dolarek bexşandibûn Netewên Yekgirtî ji bo alikariya bi sedhezaran Pakistaniyên li ser bûyerên şiddetê cih û warên xwe terikandibûn. Cotstêrkan bi vê alikariya mezin bala rayagiştî kişandibûn ser xwe. Di daxwuyaniya Komiseriya Penaberên NYê de hatibû gotin ku, ji ber alikariya Weqfa Jolie-Pitt ew minetdar in. Di daxwuyaniyê de, herweha hatibû gotin ku, wê ev alikarî bigihîje ew kesên "Ji bo qriza herî mezin ya di salên dawî de qewimiye." Jolie, di sala 2001ê de, bûbû sefîra niyetpakiyê ya NY ê û di sala 2005an de ji penaberên Pakistanê ziyaret kiribû.

# Piraniya jinên Kurd hatine xetenekirin




**Almanya** - Saziyeke Almanî di avrêla sala 2009an de li Başûrê Kurdistanê rapirsîneki pêk anî di encamên rapirsînê de ku li 148 gundan de hatiye kirin, diyar bû ku ji sedî 61ê jinan hatine xetenekirin. Li gor rapirsîna Institut für Islamfragen ku di sala 2008an de hatiye kirin de li gor parêzgehan rêjeya jinên xetenekirî wiha ye:

Li gundên Silêmanî û Hewlêrê ji sedî 94, li herêmên Ranya û Qeladizê (Silêmanî) ji sedî 95, li Hewlêrê ji sedî 76, li Silêmaniyê ji sedî 65.

Cîgirê Rêvebirê Komisyona Rapirsinê Fallah Marah Khan da xwiyakirin, ku wan di meha avrêlê de kampanyayekî li dijî xetenekirina keçan daye destpêkirin. Li gor Marah Khan piraniya xetenekirinê di demsala biharê de pêk tên.

Pizîşka jin û zarokan û parlamentera jin Aryan Xalis Cewad xetenekirina jinan wek sitemkarî binav kir. Cewad da xwiyakirin ku xetene kevneşopiyeke, ku di encama wê de beşek ji organên cinsî yên keçan tên jêkirin.

Jineki ku bi qasî 20 salan li Kurdistanê keçan dixetine ji dibêje ew di karê xwe de, xwe dispêrê Îslamê. Ev jin salane nêzîki100 keçan dixetine. Ji bo her xetenê ew 1,5 Dolarên Amerîkî werdigrê: "Xetenekirin tenê divê li gor hedîsên pêxember werin pêkanin. Ev kevneşonî ji demeki dirêj ve gihiştiye me û ev yek di Îslamê de heye. Pêxember ferman daye me ku em vê yekê bikin, ji bêr vê ji em vê yekê pêk tînin".